*Di sala 1990î de li gundê Qermîliq- navçeya şiyê ya Efrînê hatiye dunyayê, li Zanîngeha Rojava beşa ziman û wêjeya kurdî xwendiye, niha jî Mamosteya Zimanê Kurdî ye.

Hezar şevên bêheyvbûyî
Bêparbûna ji siya evîndaran

îro bûne xemgîniyên hezdila min

Hezar danerên bingehê jiyanê
Bi guleyên derwêşên serdemî

Hezar gorên di hembêza giyanê
Vexwarine ji zelaliya ava zemzemî

Hezar biskên raçandî findên cîhanê
Bi libên zeytûnê xemlî doza hemdemî

Hezar vîndar û şiyandarên dilhêvînê
Ji Nemrûdan re vekir deriyên cehenemî

Hezar salên mêjûya vê dibistanê
Ji rizgarvaniya rastiyan re bûne gemî

Hezar kevok û şalûlên ku didin azanê
Difirin li ser warên zeytûn û genimî

Hezar dewatên li ser xaka kevanê
Lewendên fêris û bûkên xanimî

Îro bûne kenê ji nava şîna giran

Hezar Cengên Bêdawî



Cemîl Xoce*

Hezar kulên derbûyî
Ji nexweşiya xerîbiya bêderman

Hezar birînên vebûyî
Bêrîkirina yarê tîne ziman

Hezar qîrînên bilindbûyî
Derdikevin ji dil û cegeran

Hezar rojên biyanîbûyî
Windabûna bîranînên zeytûnan

Hezar hêviyên koçbûyî
Ji warê keda bav û kalan

Hezar dilên neşadbûyî
Ji dûrbûna bihara cejnan



*Ji navçeya Mabeta ya girêdayî herêma Efrînê ye. Di Sala 1993'an hatiye dunyayê. Endamê Saziya Zimanê Kurdî bû, ji sala 2013an ve bûye mamostayê zimanê kurdî. Gotinên stranan dinivîse û ji 2017an ve dest bi nivîsandina helbestan kiriye.

Bavê Azad: Ê fermo bêje.

Diya Azad: Dîsa ew seyda hat, min kezeba xwe da û gula min da dest min, ez jî bûm weke wan dayikên serbilind û hew tune bû ez bifirim.

Bavê Azad: Ê baş e, ya girîng tu ji wê kulê derket.

Diya Azad: Na bavê Azad.

Bavê Azad: Çima hîn çi maye?

Diya Azad: Min dixwest ku tu bi min re ba ji bo min ew gul daba te.

Bavê Azad: (dev li ken) Çima, a min çi ye, te kezeba xwe da û gul ji mafê te ye.

Diya Azad: Na, ji bîr neke kezeba min û ya te yek e.

Bavê azad: Tu zanî diya Azad, dema tu behsa kezebê dikî wêneyê Azad tê ber çavên min.

Wilo dengê zilamekî ji derve tê dibêje yadê.. yabo.. ka kî li mal e.

Diya Azade diçe pêşiya wan dibîne du zilam û du keç in.

Mêvan: Dema te xweş be dayê.

Diya Azad: Ser seran û ser çavan.

Mêvan: Em dikarin derbas bin.

Bavê Azad: Ew kî ne diya Azad?

Diya Azad: Belê derbas bin, mal mala we ye.

Mêvan derbas dibin.

Mêvan: Hûn çawa ne, rewşa we çawa ye, qey hûn tenê li mal in?.

Diya Azad: (Dev li ken) Em ne bi tena xwe ne, lê hema em tenê man e.

Mêvan: Çawa?

Bavê Azad: Zarokên me tev de mezin in û tevli karê şoreşê bûne anha her yek li bajarekî kar dike.

Mêvan: Pir baş e, ji xwe em ji malbatên weke we moral digirin.

Diya Azad: Ka hûn ê çi vexwin?.

Mêvan: Bibûrin em nikarin ji ber karên me yê cuda hene.

Bavê Azad: Na çênabe.

Mêvan: Bawer bike em ji bo rewşekê hatine.

Bavê Azad: Ger alîkarî pêwîst be, em amade ne.

Mêvan: Bêguman we zêde jî daye.

Diya Azad: Tu dikarî peyva xwe zelal bikî?

Mêvan: Rastî hûn zanin em di şoreşê de ne, şoreş pir zor in, şehîd pir dibin, barê li ser wijdanê me giran dibe, heyfa hemû şehîdên me soz e ku em ji bîr nekin, bi rastî kurê we Azad…….!

Diya Azad: (behetî)…. Şehîd ket!

Mêvan: Serê we sax be, va ye bawernameya şehadeta wî jî.

Piştî xuleyeke bêdeng, diya Azad berê xwe da bavê Azad.

Diya Azad: Azad şehîd ket, bû firişteyek li ezmanê welatê xwe û gulek diyarî ji min û te re hişt.

Bavê Azad:(Kela girî di qirka wî de) Xewina te bi cî hat.

Diya Azad bawernameya şehadetê digire û dide bavê Azad, bavê azad bawernameya şehadeta Azad digire maç dike, êdî diya Azad dilîlîne.

Perde

■ **Tabloya: Tolîn Umer**

ez dikarim bidim te.

Diya Azad: Ka çawa ez ê bidim?

Seyda: Tu yê destê xwe deynî ser kezeba xwe û bibêjî (biçe kezeba min, tu yê niha bibî guleke pîroz û firişteyek li vî ezmanê ku ji min bêhtir bêriya te kiriye). Piştre tu yê destên xwe hildî ezmanan, dê şewtek dijwar têkeve dewsa kezeba te û tu yê bibînî çawa kezeba te bûye wêneya firişteyek bedew, ger te gul dît ji min re bibêje ez ê gula te bidim te.

Diya Azad weke seyda jê dixwaze dike"destê xwe datîne ser kezeba xwe û dibêje (biçe kezeba min, tu yê niha bibî guleke pîroz û firişteyek li vî ezmanê ku ji min bêhtir bêriya te kiriye). piştî wê wek ku êşek dikeve canê wê û diêşe, êdî seyd gula wê dike destê wê de û diçe.

Dîmen bidawî bû

Dîmen 5

Serê sibehê bavê Azad û diya Azad taştê bi hev re dixwin û dibe pirsa xewina diya Azad.

Bavê Azad: Ka te negot?

Diya Azad: Min çi negot?

Bavê Azad: Te doh tu xewnên dî nedîtin.

Diya Azad: (dev liken) Belê bavê Azad, min dît.

Diya Azad: Qey qlelenê wê çiye û çima ez nikarim bidim?

Seyda: Qelenê vê gulê ew e ku tu kezeba xwe bide, qelenê vê gulê kezeb e kezeb! Ma tu dikarî kezeba xwe bidî?

Diya Azad: (Serê xwe berdide ber xwe û xemgîn dibe).

Seyda di riya xwe de vedigere.

Dîmen bidawî dibe

Şewq vedimire

Dîmen 3

Bavê Azad: Ê pê nehizire.

Diya Azad: Ma çawa nehizirim bavê Azad ! Ev îro çend roj ez li ser hev vê xewinê dibînim!

Bavê Azad: Eger îro çend roj tu dibînî, bêguman wê îşev jî bê xewina te, ger vê carê hat tu jî kezeba xwe bidiyê.

Diya Azad: Tu çi dibêjî bavê Azad, Seyda dibêje qelenê vê gulê kezeb e, ev kezeb e ne tiştekî hêsan e.

Bavê Azad: Ê te ez şaşomaşo kirim diya Azad, ez dibînim ku dilê te li ser wê gulê diêşe.

Diya Azad: Ê ne tu nizanî bê çi qasî xweşk û bedew bû, rengên wê pir biyanî bûn, bêhina wê pir xweş bû, ji xwe dema ku wan dayikan ew dixistin ber biskên xwe, çi qas bi xemla wê gulê xweşk û bedew dibûn û serê xwe pê bilind dikirin.

Bavê Azad: Diya Azad! Ger tu wilo dibêjî xuya ye ew gul pir hêja ye, biner qelenê wê çi ye bide û dilê xwe têxe cih, helbet wan dayîkan jî kezeba xwe dane, heta yê seyda ew gul da wan, tu jî weke wan bike û gula xwe bistîne.

Diya Azad: Ma eger ez kezeba xwe bidim, tu pê naqeherî.

Bavê Azad: Bê guman ez dixwazim tu jî weke jinên din bedew û serbilind bî.

Diya Azad: Baş e, ger îşev bê xewina min, ez ê jî kezeba xwe bidim û gula xwe bistînim ji bo ez jî serbilind bibim.

(şewq hêdî hêdî kêm dibe weke ku bû êvar êdî dîmen dibe xewna diya Azad ya şeva bê).

Dîmen bidawî dibe

Dîmen 4

Dîsa jî diya Azad û dayikên li taxê bi hev re rûniştîne dibînin ku seyda tê û gurzek gul di destê wî de ye, hêdî hêdî bi aliyê wan de tê û disekine û her dayîkekê gulekê ji wî gurzê gulan dide wan heta dighê ber diya Azad û vê care jî tu gulan nade wê.

Diya Azad: Çima tu gulekê nadî min.

Seyda: Carên berê min ji te re got gula te tune ye, ji ber tu nikarî qelenê vê gulê bidî.

Diya azad: Belê ez dikarim bidim; ger ez bidim tu yê gulekê ji van gulên pîroz bidî min?

Seyda: Êdî gotin hat guhertin, belê

şehîdan bidin.

Diya Azad: Çaxê te baş be bavê Azad, bêhina xwe fireh bike, hîn gelek li pêşiya me maye.

Bavê Azad: Erê bavo! Hîn em li kûûû û dawiya vê şoreşê li kûûû.

Diya Azad: Rêyek dûûûûûûr pir dûr, diçe diçe diçe heta ku di nava asoyên wendayî de ew jî wenda dibe.

Bavê Azad: Çi wenda dibe?

Diya Azad: Rêya me, her em diçin dûr û dirêjtir dibe, hîn jî dawiya wê ne diyar e.

Bavê Azad: Te xêr e diya Azad, tu mayî gotinên nefamkirî dibêje, çi bi te hatiye?

Diya Azad: Na bavê Azad na, ne ku gotinên min nayên famkirin, lê bi rastî jiyan tev de nema tê famkirin.

Bavê Azad: Çawa tê gotin?

Diya Azad: Wek ku em di xewnan de jiyan dikin, tevî wilo em xewnan jî dibînin.

Bavê Azad: Gelo çima?!

Diya Azad: Ji ber jiyana me tev de xewin in, xwezî xewinban jî, lê ez Azadê xwe jî di xewnan de nabînim.

Bavê Azad: Ez dibînim rewşa te ne ser xwe ye, tu pir di xewnan de dihizirî.

Diya Azad: Erê, van sê-çar rojên derbas bûne, her şev ez dubare xewnekê dibînim û her ez şiyar dibim jî, ez pir li ber xwe dikevim.

Bavê Azad : Çima tu çi dibînî?

Diya Azad: Ez dibînim ku ez ne hêja me gulekê jî.

Bavê Azad: Diya Azad! Xweşik bêje. Ji bo ez tiştekî ji te fêm bikim.

Diya Azad: Ka were ez xewina xwe ji te re bibêjim.

Bavê Azad nêzî wê dibe û dest bi çîrokê dike û dibêje: Ez û çend dayikan li taxê bi hev re rûniştîbûn, me behsa karên rojane dikir. (Bi hevoka dawiyê re ronahî hêdî hêdî kêm dibe heta vedimira, ji xwe dengê diya Azad jî pê re hêdî dibe heta disekine û dîmen bi dawî dibe.)

Xewna diya Azad bi dîmenekê şirove dibe

Dîmen 2

Diya Azad û çend dayikên li taxa wan, bi hev re rûniştîne, dibînin ku mirovekî cil spî gurzek gulên pir xweşik di destê wî de ne, ji dûr tê bi aliyê wan de, ew jî ji bo pêşwaziya wî radibin ser xwe, tê hinekî li ber wan disekine, her yek ji wan gulekê ji wî gurzê gulan dide wan, lê dema dighe ber diya Azad tu gulan nade, ji bo vê yekê diya Azad pirs dike.

(ev dîmen tevgereke bêdeng e û bi muzîkekê re ye)

Diya Azad: Kanî gula min seydayê binirx?

Seyda: Ê te, gula te tune

Diya Azad: Çima?

Seyda: Ji ber ku qelenê vê gulê buha ye, her kes nikare qelenê vê gulê bide.

Gula pîroz

Azad şehîd ket, bû firişteyek li ezmanê welatê xwe û gulek diyarî ji min û te re hişt.

Alan Ebdela*

Dîmen 1

Li ser textê şano dîmen û wêneyên malekê diyar dike, dengê girtina deriyê malê tê, bavê Azad derbas dibe.

Bavê Azad: (bi dengê bilind) hero şehîd hero şehîd, heta kengî em ê

*Di sala 1987an de li Qamişloyê ji dayik bûye, li Akademiya Celadet Bedirxan a Ziman, Dîrok û Wêjeya Kurdî, xwendiye. Endamê yekîtiya rewşenbîran a herêma Cizîrê ye, niha li Desteya Çandê dixebitê.

Teyrê tawis

Pêdiviya me bi teyrekî tawis heye ku nexweşên pirsgirêkên derûnî karibin pirsgirêkên xwe yên kesane yan ferhengî çareser bikin

perîkên wî yên rengereng hil bikin û bihêlin bibe mirîşk

(Teyrê tawis ev yek got?!!! Wax wax wax)

Kergoşk

Pêdiviya me bi kergoşkekî heye

ji bo ku her guneheka ew çend piçûk bike, em guhên wî badin

û gêzera wî bi aliyekî din ve li ba bikin

Legleg

Pêdiviya me bi leglegekî seqet heye

(ji bo heqaretkirin û henekpêkirina seraqet û guhdana bi dab û adetên kevn ên kulturî)

Rovî

Pêdiviya me bi roviyekî zilamane heye

da qene bi gotinên hizrane biaxêve

û ji "Derve" hatibe

(heger Farisiyeka şikestî û devokeka keçikane bizane dê baştir be)

Beraz

Hewcedariya me bi berazekî heye

ku bi tenê xwarina wî guneh be

(Can)

Zebra

Em zebrayekê dixwazin

ku bi xêzên wê dîwarê zindanê bixemilînin

(da li hember xwekuştina ji bêzariyê raweste)

Zirafa

Hewcedariya me bi zirafeyeka Arî heye

ku stûyekî wê yê dirêj û balkêş hebe û -ji me bêtir- hay ji pelên daran hebe

Meymûn

Me meymûnek divê; hema wisa

(Girîng: divê nîvrûyê wî dilrevîn be da ku xwe berde qada siyasî)

Hirç

Pêdiviya me bi hirçekî sistikî heye

da welatiyan bide xebitandin û çerxa aboriyê ya giran -li gel tirsandin û bizdandinê- bigerîne

Mar

Pêdiviya me bi marekî lastîkî heye

da milet di nava xebatê da vegevizîne

Ker

Em hewceyî kerekî padîşahîxwaz in

ev tam daxwaza xwestekarê desthilatdariya domdar e ku li ser serê welatiyên hema bibêje razayî ye

Kataloga Baxçeyekî Ajelan ê Îranê

Helbestkara Îranî: Leyla Fercamî*
Wergera ji zimanê Farisî: Ebas Mûsa*

*Leyla Fercamî: Helbestkareke îranî ye. Sala 1972yan li Tehrana paytexta Îranê ji dayik bûye. Sala 1986an, dema şerê di navbera Iraq û Îranê da gur dibe, pena xwe dibe DYAyê û hetanî îro li wir dijî. Li gel ku derûnnasî xwendiye û her di wî warî de kar dike, lê ji şazdehsaliya xwe ve dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Ji bilî helbestan, Leyla Fercamî wergera di navbera zimanên Îngilîzî û Farisî de jî kiriye.

*Ebas Mûsa: nivîskar, rojnameger û çalakvanê çandî ye. Sala 1983yan li gundê Sogiyayê yê girêdayî Tirbespiya Rojavayê Kurdistanê hatiye dunyayê, bi kurdî û erebiyê dinivîse, di warê wegerê de hem tecribeyeke wî heye di navbera zimanê erebî, kurdî û farisî de. Kurteçîrok, bexşan, her weha lêkolîn û gotrên girêdayî wêjeyê dinivîse. Di warê ragihandinê wekî peyamnêr û edîtor xebitîye.

Zilamekî xerîb hate bajêr, li kolanan digeriya û li her cihê ku tê re derbas dibû tirs dihişt. Kalemêrekî rûqermiçî bû. Xwedî dengekî zivir û qebe bû, peyvên ji devê wî derdiketin bi xwe re hişyarî hildigirtin ku dunya li ber rûxandinê ye, û temenê dunyayê hindik maye û dê lehiyeke rabe û hemû giyaneweran li ber xwe bibe.

Metirsiyek kete nava xelkên bajêr, bawer kirin ku mirin tê, rûyên wan bêmad bû û xemgînî li wan diyar dibû, lê belê cesaret û hêzeke ne normal wergirtin, êdî nema tu hesabî ji şah û leşkerên wî dikin, nema bac didan û hesabê zindan, işkence û darvekirinê nedikirin.

Şah mat mabû ji vê veguhertina rewşa xelkê, tu şîrove jê re nedidît, wezîrê xwe erkdar kir ji bo fêmkirina vê arîşeyê û şopandina vê rewşê.

Wezîr piştî çend rojan vegeriya, ji şah re got: Ew bawer dikin ku mirin tê.

Şah bi matbûyîn got: Mirin tê??!!

Wezîr bersiv da û got: Zilamekî xerîb hiştiye bawer bikin ku mirin tê.

Şah hêrs bû, bang kir: Yekser wî yê xerîb bînin.

Wezîr girnijî û got: Ew di zindanekê ji zindanên şahê min de ye.

Yê xerîb biçûkxistî, şikestî û bi qeyd û zincîran girêdayî anîn, şah ser û binî bi mereqdarî pişkinîn kir û got: Tu yî yê ku propagandaya ku dibêje; wê tehlûke bi ser şanişîna me de were, belav kiriye?

Zilamê biyanî bersiv da: Tişta ku ez dibêjim ne propaganda ye, ev rastî ye, mirov; ji goşt û hestî pê ve nemaye û dema tehlukeya bedena şerxwaz hatiye, tu tişt nikare wî ji mirinê rizgar bike.

Şah bi hêminî got: Tişta tu dibêjî rast e, tu tişt wê nikaribe te ji mirinê rizgar bike.

Berê xwe da celadê ku li kêleka wî sekinîbû û şûrê xûz di dest de bû, teliya xwe bi ber zilamê biyanî ve dirêj kir û got: Serê wî jê bike.

Celad; yekser şûrê xwe li qirika yê biyanî xist, serî li erdê gindirî, û di pey re jî laş kete erdê hinekî li ber xwe da û bêdeng bû.

Şah axîneke rihetbûnê kişand, û berê xwe da baxçe, bangî keybanûyê kir û jê re got li kêleka min rûne, jê pirs kir: Tu ji kîjan cureyên gulan hez dikî?

Keybanûyê destê xwe da devê xwe û got: Qerenfilên sor.

Şah ferman da ku hemû darên baxçe bên birrîn û hemû cureyên gulan rabin û li şûna wan gulên qerenfilên reng sor bêne çandin.

Qerenfilên sor şîn hatin, keybanû gelekî kêfxweş bû, ji ber dema ku ro diçû ava baxçe bi rengê qurmuzî şewq dida, her wiha şah jî şad bû, zêr di gencîneyên wî de zêde bû, û xelkê mirin ji bîr kir.

JIBÎRKIRIN




Zekeriya Tamir*
Wergera ji erebî: Aram Hesen*

* Zekeriya Tamir: Nivîskar, rojnamevan û çîroknivîsekî Sûrî ye, di cîhana erebî de yek ji çîroknivîsên herî navdar e. Di sala 1931ê de li Şamê ji dayik bûye. Di wezareta çandê ya Sûriyeyê de kar kiriye, her wiha sernivîskariya çend kovarên wêjeyî kiriye. beşdarî damezirandina Yekîtiya Nivîskarên Ereb li Sûriyeyê bûye. Niha jî li Brîtanyayê dijî.

*Aram Hesen: Ji Qamişloya Rojavayê Kurdistanê ye. Ziman û Wêjeya Erebî li Zanîngeha Helebê û Peymangeha Zanistên Perwerdehiyê li Qamişlo xwendiye, di Kovara Şermola de serenivîskarê beşa kurdî ye. Li Zanîngeha Rojava di beşa Ziman û Wêjeya Kurdî de perwerdekar e, her wiha di warê wergerê de jî dixebite.

Navê pirtûkê: **Rastiya Tawûsê Melek û çend rastiyên Êzdiyatiyê**

Nivîskar: Cevdet Tutku

Naverok: Lêkolîn



Pirtûk li ser sê mejarên sereke hatiye sazkirin. Di beşa yekem de berê xwe dide ser çanda Mezopotamyaya kevnare û li ser vê çanda kevnare ya ku bandor li olên mezin (Cihû, Xiristiyan, Îslam) jî kiriye sekiniye. Di vî warî de nivîskar vê derdixe pêş: Ev olên mezin mîtolojî û bawerî ji î anda Mezopotamyayê ya kevn girtine. Elementên çanda Mezopotamyayê yên kevn di nav ola êzîdiyan de jî hene, wan weke olên mezin ji Mezopotamyayê negirtine, êzîdî parî eyek ji wê çanda kevn bi xwe ye. Ew domdarê wê î anda kevn in.

Ligel agahiyên kevnare, nivîskar di vê beşê de li ser Tawûsê Melek jî sekinîye. Ew pirsên wekî "Tawûsê Melek berê kî bû?" Çima bawermendên olên din Tawûsê Melek xirab nîşan didin?" dipirse û dikeve dû bersivên van pirsan û hin pirsên din.

Di beşa duyemîn de ew li ser malbata Mala Misto sekiniye, ew malbateke êzîdî bû ye, ku ji aliyê misilmanan ve hatine qirkirin.

Di beşa sêyemîn li ser Austen Henry Layard sekiniye. Nivîskar li ser vê babetê li bajarê Oldenburgê di konferensa sala 2019'an de gotarek pêşkêş kiriye ku ev gotar xistiye vê pirtûkê jî. Li gor nivîskar ji bo dîroka êzîdiyan Layard î avkaniyeke mezin e û bi vê xwestiye xwendevan baştir Layardî binasin.

Dr. Eskerê Boyîk ku ji bo pirtûkê tiştin nivîsine, dibêje: "Bi texmîna min ev lêkolînên ji aliyê nivîskar ve hatine kirin, ji bo lêkolînvanên pêşerojê wê karibin bibin bingeha zanyariya Êzdînasiyê ya xurt."

Hejmara rûpelan: 184

Cih û dîroka weşanê: Weşanên NAyê /2022

Navê pirtûkê: **Pêxemberê Jibîrçûyî MANÎ**

Nivîskar: Kamran Simo Hedilî

Naverok: Lêkolîn



Di serdema xwe de ola Aştiya Rastî, ya ku Manî jê re pêşengî kirî, li rojhilat dibe reqîbê ola Zerdeştî ya ku di wê serdemê de ola fermî ya Împaratoriya Sasanî bû. Lewma dijminahiya oldarên Zerdeştî li hemberî wî tûnd e û di dawî de wî didin kuştin. Ewqasî ji ramanên wî ditirsin, piştî ku didin kuştin, laşê wî post dikin.

Li rojava jî ola wî dibe reqîbê dêra xiristiyaniyên katolîk. Neyartiya dêrê dike ku împaratorê Romê Dioeletianus fermanê bide da hemû berhemên wî werin şewitandin.

Fermanên tunekirina berhemên wî bi sedan sal berdewam dikin. Li gelek cihan, bi berhemên wî re bawermendên wî jî têne tunekirin. Ji ber êrîşan, li her derê cîhanê oldarên wî neçar dimînin ku di nav ol û rêolên cuda de xwe veşêrin.

Li aliyê din jî gelek derdoran xwestine ku Manî ji rastiya nîjada wî dûr bigirin. Nexwestine wî bi gelê wî bidin nîşandan. Lê êla bavê wî û ya dayika wî bi navên wê serdemê heta îro jî di nav kurdan de dijîn.

Hejmara rûpelan: 312

Cih û dîroka weşanê: Weşanxaneya Şilêrê /2021

Navê pirtûkê: **Hêlîna Şoreşê**

Nivîskar: Ridwan Nesrî Silêman

Naverok: Roman



Ev roman li ser jiyan û serpêhatiyên çend malên Rojavayê Kurdistanê hatiye nivîsandin, hema hema hemû tiştên hatine nivîsandin hatine jiyankirin. Lewre mirov dikare pirtûkê weke beşeke ji civaka Rojava bigire dest, ji alîyekî din ve hinekî erdnîgariya Rojava, rewşa aborî, çandî, urf û adetên kurdî û bi taybetî rewşa gel a siyasî û neteweyî, t; de bibîne.

Hejmara rûpelan: 404

Cih û dîroka weşanê: Weşanxaneya Şilêr /2021



Navê pirtûkê: **Ronahî û find ji şevbuhêrkên gund**

Nivîskar: Salihê Heydo

Naverok: Folklor

Pirtûk beşekî pir girîng ji jiyana gundîtî û rabûn û rûniştina resen û tore û sincên civaka Kurdî tîne raçavkirin û destnîşakirinê, bi her cûreyên xwe ve ev pirtûk jî dibe beşek ji dîtin û bîrhatinên nivîskar Salihê Heydo ji dema ku wî çavê xwe di wê gêrrê de vekir û wî ew hemî bi hûrgiliyên herî hûr aniye zimên û ew nivîsandiye bi awayekî ron û zelal.

Cih û Dîroka Weşanê: Çapxaneya Dilav, Hesekê/ 2022

Navê pirtûkê: **Pîştî Te**

Nivîskar: Ednan Îbrahîm

Naverok: Helbest



Helbestvan Ednan bi şêweyê helbesta serbest ketiye qada hûnandina qesîdeyan bi peyvine hêsan û gelerî bi mijarên cûrbecûr weke aşiqê ronahiyê bi tîr û kevanê Xanî û Cegerxwîn û hwd, Xec û Edûlan xwe vegirtiye, bi dilekî hezker wê ronahiyê bi trajediyan re hevîr dike, li paş gotinên, rewîştên Bekoyan û mejiyên cemidî weke endam û leşkerên dij-jiyanê dinûmîne. Di her helbesteke xwe de, weke rengekî sereke, di tabloya zarevekirin û qada wî de cih digre. Di dilnazî û nîgaş û wêneyên biwêjên kurd de, li dinyaya jiyana azad û li bextê ketî gereke zirav heye.

Helbestvanê vê berhema ciwan, xwe noqî destan û efsaneyan dike, li tolhildan û rizgarvanan digere, li çiya û deştên Kurdistanê li şopa şehîd û hêlînên bilbilan digere, bi qesîdeyên pexşanî bêyî ku ji mûzîk û ritmê dûr bikeve. Ev berhem bi evîna dilê xwe û şîra salan ji hest û hizran xwe dawerivandiye zerka wêjeya Kurdî ya ji xeml û rengên keskesrora welat xwe vedigire.

Hejmara rûpelan: 94

Cih û dîroka weşanê: Weşanxaneya Şilêrê /2021

Pirtûkên Derketî

Navê pirtûkê: **Pilingên di roja dehemîn de**

Nivîskar: Zekeriya Temir

Werger ji erebî: Şêrko Abdulrehman – Raman Hesê

Naverok: Çîrok



Çîroka pilingên di roja dehemîn de yek ji pirtûkên herî navdar e, ku ji aliyê nivîskarê Sûrî Zekeriya Temir ve hatiye nivîsandin. Ev çîrok behsa hêza desthilatdar û hukûmetan û rêbazên wan ên tepeserkirinê yên ku ji bo kontrolkirina gelan bi kar tînin, dike. Ev mijar ji wan kesayetiyên temsîlî xuya dike ku zilamek desthilatdar nîşan dide ku karakterê tamkerê ku di hunerên tamkirinê de hosta ye, û ew hêza xwe li ser komek xwendekarên xwe yên ku hewl didin hunerên hêzê û bandora wê piştî wî bi dest bixin nîşan dide.

Nivîskar destnîşan dike ku merivên desthilatdar û hukûmetê çawa gel kontrol dikin, bi kontrolkirina xala lawaz û desteserkirina hewcedariyên wan ên herî mezin û xwestina wan. Ev bi dîmena zilamê tamkirî yê ku piling girtiye û kaş kiriye ber bi qada desthilatdariya xwe ve tê xuyang kirin da ku dest bi merasîma nîşandana hêza xwe li ber şagirtên xwe bike, li ser vê pilingê ku piştî hêza ku wî şikand, feqîr bû.

Çîroka pilingên di roja dehemîn de cîhanek paralel ava kir ji cîhana rastîn a ku nivîskar tê de dijî. Ji ber ku polîtîkayên çewisandinê yên ku ji hêla karakterê tamkirî yên çîrokê ve têne meşandin û rewşa nexweş, rûreşker ku karakterê pilingê temsîl dike, pêvajoya zordestiyê ya ku ji hêla desthilatdaran ve li dijî welatiyan pêk tê, dike.

Cih û dîroka weşanê: Weşanên Navenda Mezopotamya ya Wergerê, Weşanxaneya Şilêr / 2022

temenê wî mezin dibe, ji bo wî dizîvire wek taybetmendiyekê. Çi pêwîstiyên wî hebin dixwaze hinek ji bo wî pêk bînin, heta di romanê de ewqas bi pêş de diçe, pêwîstiyên xwe yê jiyanî jî êdî nikare xwe bi xwe bike.

Ji ber ku di romanê de bûyerên ku tên jiyîn pir dirêj in, naxwazin nivîsên xwe bi naverokên zêde bifetisînin. Bi kurtasî taybetmendiya Oblomov û feraseta Oblomovtî di vê mijarê de çawa derbas dibe, anî ser zimên. Hêja ye ku ew roman bê xwendin. Ji ber ku dema min ev roman xwend, her çi qas weke Oblomov bê xîret nebim jî, di hin aliyan de min xwe jî tê de dît. Dibe ku li derdora me kesên bi vî rengî hebin. Kesênku ji bo jiyana xwe rast bikin, plansazî dikin lê tu carî pêk nayînin, ji bêkariyê bêzar in lê ji bo ku kar bikin, li kar nagerin. Dema kar bibînin jî bi bihaneyekê dev jê berdidin, ji bo çalakiyên jiyanî û civakî ji cihê xwe ranabin û xîret nakin ku tiştekî pêş bixin.

Her çi qas nivîskarê romanê Gonçarov rewşa Rûsiyayê bi lêv kiribe jî, di roja me ya îro de jî weke nexweşiyekê di nava hin mirovan de heye. Yek ji sedeman malbat e. Malbat zarokên xwe bi çi awayî mezin bikin, wisa di jiyanê de tev digerin. Ew digihêjin vê astê ku dixwazin xwe ji vê rewşê xelas bikin, lê ew hînbûn nahêle ku guhertin zû bi zû pêş bikeve. Ji aliyekî din ve kesayet baweriya xwe ya cewherî jî winda dike. Wek kesayeteke bihêz û xwedî vîn nikare di jiyanê de bi berpirsyarî tev bigere. Ji civakbûnê dûrketin, di quncikên xwe de mayîn û li hemberî jiyanê xemsarî pêş dikeve. Wateya Oblomovtî li ser wan taybetmendiyan ava bûye.

Wek her mijarê di vê mijarê de jî em dikarin bandora pergala kapîtalîzmê wek sedem nîşan bidin. Her ku teknîk bi pêş dikeve û hêza fizîkî ya mirov li paş dimîne, em bixwazin nexwazin di aliyê xuliqkariyê de lewaztî çêdibe. Pêwîstiya mirov ji bo her karî namîne. Di nava civakê de bêkarî zêde dibe. Ji ber serdema kapîtalîzmê teknîk ewqas hatiye pêşxistin, karê ku sed kes dikin makîneyek bi tena xwe û bi zûtirîn dem diqedîne. Qaşo bi hêsankirina jiyana mirovan pergala kapîtalîzmê mirov ji kedê, xuliqkariyê, yekîtiya hêza mejî û fîzîkî dûr dixe. Ev rewş jî dihêle ku xemsarî, sereserebûn, giranî û... hwd, di derûniya mirovan de rû bide.

Di romana Oblomov de bûyer û diyardeyên ku di kesayeta qehremanên romanê de hatine bilêvkirin, di roja me ya îro de hîn jî dijîn. Ji ber hîn jî malbat zarokên xwe bi feraseta xwe bi jehrî dikin. Pergala kapîtalîzmê hîn jî li ser civakê dilîze, bêkêr û bêkar dihêle. Hîn jî kesayetên Oblomov di nava me de dijîn. Heya em vê feraseta Oblomovtî derbas nekin, çi qas dem û demsal jî derbas bibin, nivîskarê romanê ji bîr nekin.



■ **Qapa romana (Oblomov) ya bi zimanê Rosî**

Bolşefîkan de jî bandora Oblomovtî heye û di nivîsên xwe de wiha tîne ziman: "Rûsiya sê şoreş derbas kirin, lê dîsa feraseta Oblomov ma, ji ber ku feraseta Oblomov ne tenê di nav axa, gundî û rewşenbîran de pêş ketiye, lê di navbera karker û komunîstan de jî heye. Ger hûn li xebatên wan binêrin, hûn ê bizanibin çawa di nava me de ew feraset dijî. Ji bo em vê ferasetê derbas bikin, demekê mijûlbûn, paqijkirin û hejandin pêwîst dike.".

Oblomov kî ye û Oblomovtî çi ye?

Îlya Îlyîç Oblomov araziyê ku ji bavê wî maye, dewrî keya (berdestê mala) xwe dike û koçî bajarê mezin dibe. Di wir de bêyî ku karekî bike, pereyên ku ji gund tên, jiyaneke tiral dijî. Dîtiye li Rûsiyayê guhertin çêdibe, koçî bajêr dibe, lê belê ew nikare xwe li gor vê rewşê biguhere. Em Oblomovî tenê wek kesayeteke tiral pênase bikin, têrê nake. Ji ber ku kêfa wî ji kesayetên tiral nayê, ji nexebitandinê kêfxweş nabe. Nexwe çi sedem e tiraltiyê dike? Gelo kar peyda nekiriye? Ew jî ne sedem e. Oblomov berê di saziyeke dewletê de bûye xwedî karekî baş lê bi bihaneyekê dest jê berdaye. Ew ne tenê girêdayî kar e. Oblomov her di mijarê de wisa ye. Oblomovtî jî ew e. Oblomov pirsgirêk ji ku tê û çareserî çi ye dizane. Ji bo jiyana xwe biguhere, timî plansaziyên xweş jî çidike. Lê belê tu caran wan plansaziyan pêk nayine. Di rastiya xwe de di hundirê Oblomov de cewherek heye. Ew xwedî zanebûn û çandekê ye lê şiyan û zanebûna xwe bi kar nayine. Ger Oblomov ji Oblomovtiya xwe rizgar bibe, dikare gelek tiştên baş bike. Oblomov bi piranî di nav xeyalan de dijî. Cihê ku lê rûdine û radize, gelek tiştan di mejiyê xwe de pêş dixe û pê kêfxweş dibe, lê dema mijar tê pêkanînê, dîsa çavê xwe digire radize. Wek di romanê de jî derbas dibe, Oblomov malbateke zengîn xwedî erd de mezin bûye û tu carî malbata wî nehiştiye ku karekî bike û timî bi delalî mezin kirine. Nehiştine biherike û ser lingên xwe bisekine. Her dema ku derbas dibe û

romanê dike. Carinan bûyer û kesên di romanê de cih digirin, razber in û carinan jî şênber in. Bi awayekî din nivîskar bûyerên ku hatine jiyîn an jî wek xeyalî berhemên xwe pêşkeş dike. Dema em romanekê digirin dest, pêwîstî bi lêkolîna dem, cih û ferasetên heyî jî çêdibe. Ji ber ku romanên di Rojhilata Navîn de hatine nivîsîn, Rojava (Ewropa) û Rojhilata Dûr hatiye nivîsîn û li gor çand û ferasetê, şêwe û girtina dest tê guhertin. Li aliyekî din bi xwendina romanekê, rewşa jiyana mirovên welatekî jî tê naskirin û di wê der barê dahûrandinên xwe bi pêş dixin. Bi kurtasî roman jî weke beşeke wêjeyî, di jiyana me giştî de erk û rola wê ya girîng heye. Hin roman hene ku dibin malê cîhanê yê giştî. Ji ber taybetmendiyên kesên di romanê de cih digirin bangî tevahî mirovan dikin. Ên ku romanên bi vî rengî dixwînin xwe tê de dibînin. Yek ji wan romanan jî romana 'Oblomov' e. Dixwazim di vê nivîsê de, kesayeta Oblomovî vekim û teyisandin û bandora xwe ya roja me ya îro çawa ye, bigirim dest. Dibe ku hin nêrîn û gengeşe ser vê mijarê çêbibin; 'ewqas berhemên me yên Kurdî û wêjeya me ya dewlemend heye, çima em romaneke Rûsî digirin dest?" Weke min li jor jî anî ziman, hin roman gerdûnî ne û wek kesayet di aliyê hişmendî de hin jî bandora wan li me çêdibe. Ji ber vê yekê pêwîstiyeke ku em vê mijarê bigirin dest û sûdê bidin xwendevanên hêja. Her çi qas ev berhem wêjeyî be jî, lê aliyê wê yê derûnî û civaknasî jî xurt e. Jixwe destgirtina me ya vê romanê jî di bingehê xwe de aliyê wê yê derûniya civakî ye.

Îvan Gonçarov di sala 1849'an de di kovarekê de çîrokeke bi navê 'Xewna Oblomov' parve kir. Gonçarov bi demê re vê berhema xwe hîn berfirehtir kir û di sala 1857'an de Oblomov weke roman hate çapkirin. Roman her çi qasî di 1857'an de di nava mehekê de hatibe nivisîn jî, lê di rastiya xwe de lêhûrbûna deh salan a nivîskar Gonçarov bû. Sedema ku berhemeke ewqas dirêj, berfireh û bi hostayî hatiye nivîsandin jî, ew lêhûrbûnên deh salan e. Piştî ku romana Oblomov hate weşandin, li tevahiya Rûsiyayê bi guhdaneke mezin hate pêşwazîkirin. Li tevaya welêt ji aliyê her kesî ve dihate gengeşekirin. Ji ber ku di wan salan de Rûsiya amedekariya veguhertina rewşa xwe dikir. Ji rakirina koletiyê re hîn sê sal hebû. Pergala Kapîtalîzmê ji Rojavayê dest pê kir û li tevahî cîhanê belav dibû û hêdî hêdî derbasî Rûsiyayê dibû. Şêwe û çanda civakê ji her alî ve dest bi guhertin û veguhertinê dibû. Jixwe kesayeta Oblomov jî mirovên Rûsî rexne dikir û ji mirovên Rojavayî re danberhev dikir. Ji ber vê sedemê di cih û dema xwe de hatiye weşandin û pê re têgîneke nû derketibû holê, ew jî 'Oblomovtî' bû. Lê veguherîn çi qas mezin bibe jî, Rûsiya bi hêsanî xwe ji Oblomovtî rizgar nekir. Heta îro jî dibe ku hîn ev feraset ji nava xwe neavêtibe. Ser vê mijarê Lenîn jî dibêje tevahî beşên civakî ji Oblomovtî bandor bûye heta di nava

Mîrateya Oblomov... Feraseta 'Oblomovtî'

Oblomov pirsgirêk ji ku tê û çareserî çi ye dizane. Ji bo jiyana xwe biguhere, timî plansaziyên xweş jî çidike. Lê belê tu caran wan plansaziyan pêk nayine..

Armanc Hêvî*

Roman di jiyana mirovan de, ji aliyê hizrî û hişmendî de jî rola guhertin û veguhertinê lîstiye. Di heman demê de bûyer û diyardeyên ku li welatekî rû didin weke şer, rewşa aborî, siyasî û çandî jî bandora xwe li nivîsandina

*Nivîskar û rojnamevan e, di çapameniya nivîskî de kar dike, gotar û helbestan dinivîse, di sala 2018an de Berhemeke wî ya helbestan bi navê (Rêwiyê Bê Dem) derketiye.

heyî hejmareke kêm ji pirtûkan tê weşandin(bi taybet ên kurdî), li gor we û ji ber ku hun jî di qada wêjeyê de dixebitin û helbet şopandina we di vî milî de heye, sedemên vê kêmbûnê çi ne?

Di vê der barê de mirov dikare behsa rewşa weşangeriyê bike. Weke tê zanîn weşangerî ji bilî ku erk û pewireke çandeyî ye, ew bi xwe pîşeyeke, pîşeya çêkirina pirtûkan û belavkirin û firotina wan e. ji bo ku ev pîşe bibe bi sûd pêwîst e bazara wê jî hebe û bibe babeta kirîn û firotinê. Ji xwe ji ber rewşên siyasî yên diyar derfeta weşangeriyeke durist û rasteqîn li herêma me çênebûye. Di rewşa niha de hin hewldanên weşangeriyê derdikevin, lê pir lawaz û qels in. sedemên wê jî pir in. yek jê ew e ku pîşesazên vê xebatê kêm in. ya din jî bingeh û binyada vê pîşeyê lawaz e, ji ber ku li ba me ta niha bazara kirîn û firotina pirtûkan çênebûye. Ango weşangerî ji bo kesê weşangêr hîna nebûye pîşeyeke bi sûd. Lewma niha ev pîşe hema bibêje tune ye, ya heyî jî bi destê sazûmana rêveberiyê tê kirin. Hijmara pirtûkên ku salane têne weşandin pir kêm e û bi awayên bi rêk û pêk nayên belavkirin û pêşandan û firotin. Lê bêguman di nava salan de ev qada weşangeriyê jî dê bibe xwedî ezmûn, her wiha bi rêya pêşangehên salane û pêşangehên herêmî û avakirina pirtûkxaneyên mezin dê bazara pirtûkan jî bête avakirin û mezin bibe.

-Dîmena wêjeyî ya ku em tê de dijîn herî kêm ev çend salên dawî di asta afirîneriyê de tûşî lawazîyê hatiye. Pir pirtûkên ku têne weşandin di milê afirîneriyê de ne di asta ku tê xwestin de ne, Li gor we sedemên vê yekê çi ne?

Ev pirs jî hema bibêje girêdayî pirsa berê ye, dema ku weşangeriyeke bi rêk û pêk tune be, dê pir berhemên qels jî derkevin. Em bêjin weke mînak, li welatekî ku xwedî weşangeriyeke bi hêz û kevn e, yê weşanger dê kîjan pirtûkê biweşîne? Helbet dê pirtûka ku bête xwendin û bête kirîn û bibe jêdera sûdeke diravî, lewma yê weşanger dê hewl bide ku berhemeke bi hêz û baş biweşîne, dê ji nava pir destnivîsan a herî baş bibîne û biweşîne. Lê dema ku ev bingeha weşangeriyê tunebe, dê berhemên qels jî carana têkevin bazarê û pirtûkxaneyê. Eger rojekê binyada weşangeriyê asê û tekûz bû dê ev pirsgirêk jî bête çareserkirin.

- Birêz Necim, em te spas dikin, gotina te ya dawîn.

Spas ji we re, ji bo xebatkarên kovara Şermola, bi hêvî me her serkeftî bin.

-Ta niha çend berhemên we hatine çapkirin û çend ji wan di salên şoreşê de hatin nivîsanidn û mijarên wan çi bû?

Ez bi nivîsîna helbestên Kurdî mijûl dibim, ta niha 4 pirtûkên min hetine çapkirin û weşandin, Berhevoka min a yekemîn bi navê (Kezîzer) li Bêrûtê ji weşanxaneya Amerda sala 2002'an hate weşandin. Berhevoka min ya duyemîn bi navê (Bîstikek Guneh) di tîrmeha 2006'an de li Şamê hate weşandin.

Berhevoka sêyemîn bi navê (Dilên Navser) di sala 2019'an de ji weşanxaneya Şilêr li bajarê Qamişlo hate weşandin.

Ya çarem jî (Danên bi Çêja Peyva Destpêkê) di sala 2021'ê de ji weşanxaneya Şilêr hate weşandin.

Ya dawî jî bi navê (Şevbêrkên Spî) tê payin ku vê salê ji weşanên HRRK`ê bête weşandin.

- Hun helbestê dinivîsin, lê li gor şopandina we di vê demê bi giştî di nava xwîneran de kîjan cureya wêjeyî bêhtir tê xwendin û çima?

Destpêkê hêjaye ku em bibêjin, li ba me hîna bazareke berfirh a daneriyê û nivîsînê û weşanê nehatiya avakirin. Lewma mirov nikare daneyeke wiha pêşkêş bike. Li welatê me encax salê sed an kêmî sed pirtûkan tênê

■ Ji berhemên Helbestvan Kemal Necim

çapkirin û weşandin. Ev hijmareke pir kêm û lawaz e. lewma mirov dikare bibêje çi tê pêşandan û pêşkêşkirin ew tê xwendin, pir bijarteyên fireh li pêşiya xwêneran tune ne. Weke ku tu ji yekî re bibêjî, ka tê çayê vexwe yan qehweyê? Ji xwe her du bijarte li pêşiya wî hene. ya cureyên wêjeyê jî wiha ye.

Wê çaxê mirov çawa dikare bipîve? Mirov binere ka di nava sed pirtûkên hatine çapkirin de kîjan cure zêde ye, wê çaxê ew zêde hatiye xwendin. Li gorî şopandinên min piraniya pirtûkên têne çapkirin û weşandin ên helbest û çîrokan e. wê çaxê em dikarin bibêjin cureyên herî zêde têne xwendin helbest û çîrok in. ne ku ji ber nivîsîna çîrok û helbestê pêş ketiye, lê ji ber ku her ew li ber destên xwendevanan hene.

-Piştî şoreşa Rojava, hin weşanxane hatin damezrandin, tevî wê jî li gor hin dane û amarên

■ Hefteya wêjeyî / Qamişlo 28-5-2022

bike, her wiha bandorê li derbirîna wan jî dike. Ji xwe eger mirov li berhemên wêjeyê yên van salên dawiyê binere, piranî di vê atmosfêra şer û êş û azar û berxwedanê de hatine nivîsîn. Heta dema ku yê wêjevan hin mijarên din, mîna evînê dinivîse jî ew di bin siya vê rewşê de tê nivîsîn.

-Îro em dizanin ku pêşketinên teknolojî bandoreke mezin li tevaya cîhanê kiriye, ev bandor li ser hemû beşên jiyana mirov diyar e, li gor we gelo bandora vê serdestiya teknolojîk li ser tevgera wêjeyî û daneriyê erênî bû yan neyênî bû û çima?

Hin tişt hene, mirov nikare bibêje, erê yan na, reş an spî. Her qonaxeke dîrokê, her guherîneke civakî, ramyarî û teknolojî aliyên wê yên erênî û yên neyênî jî hene. Pêşketina teknolojîk di gelek gonaxên dîrokê de têvedaneke mezin daye geşedana ramyarî û qada nivîsîn, çapkirin û weşandinê. Ez bi xwe gihiştime wê demê ku min bi Tektîloyê dinivîsî. Ji wê demê ta niha pêşketinên teknolojîk yên mezin çêbûn. Nivîsîn û çapkirin û weşandin pir hêsantir bûye. Helbet min û gelek kesên din sûdeke mezin ji vê pêşkatinê girtiye. Lê gelo bandoreke neyênî tune? Helbet heye. Niha ez bawer im mebesta we ev qelebalix û xirecira mezin yan weşana elektronîk e. ango weşana bi rêya melperên internetê û hemû sepan û programên girêdayî wê ye. Bêguman aliyekî wê yê erênî heye. Mînak ez dikarim di heman kêliyê de helbesta xwe biweşînim, ew helbest dê di demeke kurt de bi hêsanî bê pere bighêje pir xwendevanan, her wiha ez dikarim bi xwênerên xwe re têkevim têkiliyê û gotûbêjê. Lê beramberî wê aliyên neyênî jî hene, yek jê ku naverok bê ser û ber têne weşandin. Agahiyên ne tekûz û pir caran ne rast têne weşandin. Ya herî girîng jî ku ev alavên weşanê ne di destê civakê de ye, lê di destê desthilatan de ye, ew desthilat jî naverokan li gorî berjewendiya xwe diweşînin û belav dikin. Yanî ew desthilatdar bi rêya wan alavan destê xew datînin ser hizr, raman û bîr û baweriyên civakê û civakan li gorî xwe bi şêwe û pergal dikin. Ev hemû bendorên neyênî ne. lê eger dîsa em vegerin kakila pirsê, pêwîste em bêjin ku ji erkê rewşenbîr, wêjevan û nivîkaran e ku van bandorên neyênî pûç bikin.

her tişt di pêvajoya avakirin, sazkirin û çêkirinê de ye. ji hêla civakî, siyasî, rêvebirin, parastin û ewlehî, abûrî, perwerde û hwd. Lewma wêje jî weke qadeke civakê, weke rûdan û bûyerke civakî hîna di pêvajoya avakirin û çêkirinê de ye. Mirov dikare bibêje ku ev qad û rûdana civakî ya bi navê wêjeyê niha li beramberî du erk û berpirsyariyan e, yek jê xwe avakirin, sazkirin û çêkirin e. Yan din jî ji nû ve nivîsîn û belgekirina rûdanên vê pêvajoya şoreşê ye. Ango, wêje beriya ku şoreşê bide vegotin pêwîst e destpêkê nasnameya xwe ava bike, rêya xwe nas bike û zimanê xwe peyda bike. Mirov dikare bibêje ku pêwîst e destpêkê wêje şoreşa xwe lidar bixe. Bêyî vê yekî dê nikaribe şoreşê vebêje û şîrove bike û bide nasîn û belge bike.

-Bêguman şoreş bandorê li wêjevan û mijarên nivîsên wî dike, şoreşa 19 tîrmehê çiqas bandor li wêjevan û nivîskarên vê qadê kir û di milê kalîte û mijaran de çi cudahî bi xwe ra anî?

Wêje rûdaneke civakî ye, weke ku fîlozofê Fransî Jean-Paul Sartre dibêje. Ji xwe şoreş jî bûyerke civakî ye, bûyer û rûdana guherîna civakê ye. Lewma bê guman her rûdanek û tevgereke civakî dê bandorê li qada wêjeyê bike û bandorê li nivîskar û wêjevanan jî bike.

Şoreşa ku ev deh sal in li vê erdnîgariya me rû dide bi xwe re gelek

■ s Qamişlo -12-7-2020

guherînên civakî jî çêkirin û bandora xwe li hemû qadên jiyanê kir. Wêjevan jî her kurê vê civakê ye û bi gellek awayan bi van veguherînan bandor dibe. Wêjevan dema ku mijarekê vedibêje û dinivîse ew ji derdora xwe re dinivîse, her wiha ew dixwaze ku tişta dinivîse û dibêje û diafirîne ji hêla civakê ve bête xwendin û guhdarkirin, lewma ew neçar e ji hest, mereq û êş û azarên vê civakê agahdar be. Dema ku li vî welatî rewşa şer, êrîş, gef serdest be, dê helbet hest û reftarên civakê jî li gorî wê rewşê bête hûnandin. Di rewşeke wiha de afrênerê ku bixwaze derbirînên wî bêne guhdarkirin pêwîst e van êş û azar û hestan vebêje. Ev li aliyekî, li aliyê din; yê nivîskar an wêjevan bi xwe jî ji nava vê civakê ye. Ango eger civak birçî be ew jî birçî ye, eger civak mitala paşeroja xwe dike yê nivîskar jî wiha ye. Lewma tiştekî pir xwezayî ye ku rewşa şoreşê bandorê li kesayeta kesên wêjevan û nivîskar

-Rêzdar Kemal Necim, em bixêrhatina we dikin. Û ji bo derfeta vê hevpeyvînê gelek spas.

Spas ji bo we jî ku we ev derfet da me.

-Ji kerema xwe, bi çend hevokan xwe bi xwînerên Şermola bide nasîn?

Li bajarokê Girkê Legê yê herêma Dêrika Rojavayê Kurdistanê di sala 1969'an de ji dayik bûme.

Li Girkê Legê çêbûm, li wir mezin bûm û heta refa 12'an xwend, di 20 saliya xwe de li pey şopa azadî, welat û şoreşê ji gund derketim û tevli nava kar û têkoşîna siyasî bûm.

Di nîvê salên notî de min dest bi nivîsîna helbestê bi zimanê Kurdî kir. Min helbestên xwe bi piranî di kovarên herêmî de diweşandin, heta ku malperên internetê yên Kurdî vebûn, êdî min di wan malperan de diweşandin.

■ Bêrût-kovara SORGUL /2001

Di dawiya salên notî de ez çûm Paytexta Libnan Bêrûtê û li wir min dest bi karê rojnamegeriyê kir. Li wir min çend salan edîtoriya kovara SORGUL a bi zimanê Erebî kir. Ji wê çaxê de karê min yê sereke rojnamevanî û karê ragihandinê ye.

Ji destêka şoreşa Rojava heta niha ez weke edîtor di ajansa HAWAR`ê de dixebitim. Her wiha bi kar û barên rewşenbîrî ve mijûl dibim.

Ta niha 4 pirtûkên min ên helbestan hetine çapkirin û weşandin.

- Weke hun dizanin; wêje bi giştî û bi taybetî jî pexşan dikare wekî belge, ku ji bo naskirin û fêmkirina serdemekê mirov lê vegere, bi dîtina we gelo tevgera wêjeyî li Rojavayê Kurdistanê dikarîbû serborî û bûyerên Şoreşa Rojava belge bike?

Destpêkê hêjaye mirov bibêje ku şoreşa Rojava û hemû rûdan û bûyerên ku bi vê şoreşê re rû dan, hîna nebûne serboriyeke kevin ku mirov ji niha de behsa belgekirin an jî nivîsandina wê bike. Li gorî dîrokê û ezmûnên li cîhanê, pir caran nivîsîn û belgekirina bûyer û rûdanên şoreşan ne di dema şoreşê bi xwe de hatine pêkanîn. Gelek berhemên şoreşan piştî bi dehan sal hatine nivîsîn. Lê ev nayê wê wateyê ku di pêvajoya şoreşê de jî tevgera nivîsîn û belgekirinê tune bû.

Di ezmûna Rojava de mirov dikare bibêje ku her tişt ji nû ve dest pê dike,



Helbestvan Kemal Necim ji "Şermola" re:

Di rewşa niha de hin hewldanên weşangeriyê derdikevin, lê pir lawaz û qels in.

Hevpeyvîner: Aram Hesen

gemarê dişû, paqij dike û dike weke zêrê helandî. Di helbesteke xwe ya din de jî balê dikişîne ser têkiliya navbera bedewî û evînê:

Helbest: DILBERÊ SERDARÊ XÛBAN

Rohniya çehvên Melayî Xaliqê husna te dayî
Hub tinê da min gedayî husn û hub yek çeşme ye

Wateya peyvan: Çehv: Çav. **Xaliq:** Afirîner, Xweda. **Husn:** Bedewî, spehîtayî, xweşikayî. **Geda:** Belengaz, perîşan, jar, hejar. **Çeşme:** Kanî, çavkanî.

Kurtewateya malikê: Ronahiya çavê Mela û xwoşewîsta dilê wî, ew afirînerê bedewî peyda kirî û di kesayeta te de afirandî, evîn tenê daye min belengaz û perîşanî. Lê jixwe bedewî û evîn jî yek reng in û kok û çavkaniya wan jî yek e ku ew çavkanî jî Xwedayê payebilind e.

Şîrove: Cizîrî, di vê malikê de careke din derbasî mijara **Wehdetul-Wucûd'ê** (yekbûna hebûnê) dibe û têkiliya di navbera bedewî-evîn û Xwedê de wiha rave dike: "Xwedê bedewî daye te û evîn jî daye min (jixwe derveyî wê tiştek para min neketiye). Lê ev nayê wê wateyê ku evîn û bedewî ji hev cuda ne, yan jî yek ji ya din kêmtir e. Na, her du yek tişt in, her du jî nûr in û çavkaniya her duyan jî yek e. Ango her du nûr jî ji nûra Xwedê cuda bûne; nûrekê di dêmê te de cî ji xwe re peyda kiriye, yekê jî di dilê min de cî girtiye." Ehmedê Xanî jî bi heman nêrînê wiha dibêje: **Me'şûq-i tu yî bi fexr û naz î. 'Aşiq tu yî lêykî bê niyaz î**. "Xwedayo, evîn tu bixwe yî lê serfiraz, serbilind, nazdar, xwediyê tevgerên bedew û xweşik î. Xwedayo, çawa ku evîn tu bixwe yî, dildar û evîndar jî tu bixwe yî, lê ne hewcedar î û pêdiviya te bi ti kesî û bi ti tiştî nîne." Li gorî felsefeya **Wehdetul-Wucûdê** her hebûna niha di kaînatê de heyî berê di hebûna Xwedê de kombûyî bûn, sifet û taybetiyên wî bûn. Ji bo ku ji zanistê (teoriyê) derkevin û şênber bibin di kaînatê de cî ji wan re vekir û ji hebûna xwe cuda kirin. Wê bidome.

Çavkanî: Pirtûka Mele Ehmedê Zivingî-Gerdeniya Gewherî.

davikên evînê Xwedayê Hey ew davik li ber wan vedane. Vêca kesê bikeve davikên Xwedê wê çawa ji wan rizgar bibe? Ketina nava davikên Xwedê tê wateya rabûna perdeya di navbera evîndar û Xwedê de. Di malika li jêrê de jî pênasekirina evînê ya bi nûrê didomîne:

MUHBETÊ MIHNET DI ZOR IN

Nûr e pir nadirwucûd e ger çi ewwel nar û dûd e
Berqê lami' dê li kû de hub di qelban kîmiya ye

Wateya peyvan: Nadir: Kêm. **Wucûd:** Hebûn. **Nadirwucûd:** Kêmhebûn, hebûnên kêm peyda dibin. **Ewwel:** Destpêkê. **Nar:** Agir. Dûd: Dû, dûxan. **Berq:** Birûsk. **Lami':** Berqonek. **Hub:** Evîn, heskirin. **Qelb:** Dil. **Kîmiya:** (Mecaz) Tişta pir biqîmet ya xwediya taybetiyên hêja. Li vir mebest jê derman e, iksir.

Kurtewateya malikê: Ev evîna rastî ya giyanî, her çiqas destpêkê weke agir dil û mêlakên evîndarê xwe dişewitîne û weke dûyekî fetisînek çavan kor dike, lê ronahiyek e, pir kêm peyda dibe û para kêm kesan dikeve. Ev evîn weke birûskeke tîrêjavêj li kû dide û diavêje ser kîjan dilî weke iksirê wî dilî paqij dike û dike weke zêr.

Şîrove: Di vê malikê de evîna giyanî bi rengekî din pênase dike û behsa hin taybetiyên wê dike. Bi gotina, **Nûr e pir nadirwucûd e**, hem careke din pênaseya wê bi nûra îlahî dike, hem dibêje, kêm mirov hene ku bibin xwediyên vê evînê. Bi gotina **ger çi ewwel nar û dûd e**, pênaseya wê wiha didomîne: "Ev evîna giyanî destpêkê agir û dû ye, ango weke agir dil û mêlakan dişewitîne û weke dû bêhna evîndarê xwe diçikîne, çavên wî kor dike û dixe rewşeke wisa ku ha bifetise, ha bifetise." Bi nîvmalika, **Berqê lami' dê li kû de hub di qelban kîmiya ye**, behsa bandor û taybetiya wê dike. Di dijwariya bandora wê de mînandiye birûska ku tîrêj û şîrqînî jê diçin. Ango çawa ku birûsk bi wî dengê xwe yê biheybet dil û hinavên mirovan dilerizîne û bi dijwariya xwe her devera lê dikeve dihelîne, ev evîn jî xwediya bandoreke wisa ye. Lê bi gotina, **hub di qelban kîmiya ye,** balê dikişîne ser taybetiyeke wê ya din û bandora wê ya erênî. Dibêje, çawa ku kîmyaya bi navê iksirê paxir ji zenga li serê paqij dike û dike zêrê safî, ev evîna giyanî jî dil ji zeng û

xweragirtina li ber ne karê mirovên asayî ye. Di malika li jêrê de jî balê dikişîne ser yekbûna rûhê her du evîndaran:

MUHBETÊ MIHNET DI ZOR IN

Her du rûh yek nûrê tav in çerxek û du stêr di nav in
Her du dane murxê dav in ismê Hey dav lê vedaye

Wateya peyvan: Çerx: Felek, çerxa felekê. **Dane:** Lib. **Murx:** Balinde, perende, teyr. **Ism:** Nav. **Hey:** Sax, zindî. **İsmê**

Wateya peyvan: Çerx: Felek, çerxa felekê. **Dane:** Lib. **Murx:** Balinde, perende, teyr. Ism: Nav. **Hey:** Sax, zindî. **İsmê Hey:** Navê Xwedê yê Hey. **Dav:** Davik, daf.

Kurtewateya malikê: Bêguman rûhên her du evîndaran du ronahiyên ji tîrêjên rojekê (zatê pîroz) ne, çavkaniya wan yek e û ew jî ronahiya kevnare ye. Herwisa weke du stêran in û di yek çerxê de -ku çerxa evîna rastî ye- digerin. Her du jî weke murxê ji bo girtina nêçîrê libên di nava davikan de ne. Yê ew davik vedayîn jî Xwedayê Hey bixwe ye.

Şîrove: Cizîrî di vir de bi gotina, **her du rûh yek nûrê tav in**, rûhê evîndar û dilketiyê pak û pîroz dibîne û bi tîrêjên nûra Xwedayî pênase dike. Herwisa çavkaniya her du rûhan jî rojê ango zatê Xweda nîşan dide. Ango dibêje, rûhê evîndar û dilketiyê pîroz in û du tîrêjên ji nûra Xwedê ne. Çawa ku tê dîtin li gorî nêrîna wî evîn çawa ku pîroz e rûhê evîndarên xwe jî pîroz dike, heta dibe asta herî bilind ya pîroziyê. Bi gotina, **çerxek û du stêr di nav in** jî, bi mînandina du stêrên di nava çerxekê de bedewî û pîroziyeke din dide wan. Ev jî mînandineke pir bedew û pir balkêş e. Çawa ku çerxek ji bo her duyan tenê hatibe afirandin û weke du stêrên birqonek di nava wê çerxê de geşt û seyranê bikin. Bi gotina, **Her du dane murxê dav in**, mînandineke balkêştir û bedewtir kiriye. Dibêje çawa ku kewgîr ji bo girtina nêçîrê li cem davikan kewekî bi cî dike, her du evîndar jî kewên davikan in. Di vir de evîn mînandiye davikan û evnîdar jî hem mînandine libên di nava davikan de hem kewê ribat yê di rikehê de. Li vir xala herî balkêş ew e ku dibêje, **ismê Hey dav lê vedaye**, ango ji bo ku bikevin

bedenê ve girêdayî ye dema beden diçe ew evîn jî diqede. Wê demê mirov nikare ji evîna bedenî re bibêje evîneke rast e. Lê di evîna rûhî de ji ber ku dilketî namire û bedewî jê naçe evîn jî mayînde ye û evîneke rast e." Di malika li jêrê de jî pênaseya evîna rûhî dike:

MUHBETÊ MIHNET DI ZOR IN

Her kesê muhbet ji rûh e mubtela'y nûra Subûh e
Wî di dil de sed curûh e cezbe û lerzîn û ta ye

Wateya peyvan: Ji rûh e: Ango evîna rûhanî ya rastî ye. **Mubtela:** Xemxwar, gêj, bi kul û derd, kesê ji aliyê Xwedê ve bi êş û nexweşiyê tê ceribandin. **Nûr:** Ronî, ronahî, geşî, roniya tê bawerkirin ku ji aliyê hêza xwedayî ve hatiye şandin. **Subûh:** Navek ji navên Xwedê ye, herwisa bi wateya pakî pîroz e. **Curûh:** Piraneya cerh e, birîn. **Cezbe:** Rakêşan, lerz.

Kurtewateya malikê: Çi kesê evîna wî ji giyanê wî be û di dilê wî yê rastî de be ku ev jî dibe beşa pêşî ya evînê (evîna rûhî), bi nûra Xwedayê ji guman û kêmayiyan berî, gêj dibe û di ezmûna êş û azaran re derbas dibe. Ji ber wê di dilê wî de bi sedan birîn vedibin, direcife, dilerize û dikeve tayeke pir dijwar.

48- Ronahiya Peyvên Sermest, Bedran Penaber, (Lêkolîn), 2018, Ç1

49- Gotinên Pêşiyan, Silava Ararat, (Lêkolîn), 2018, Ç1

50- Keça Cûdiyê Serhildêr, Peyman Bêrî, (Roman), 2018, Ç1

51- Pêjna Feqî, Rêşad Sorgul, (Roman), 2018, Ç2

52- Kêliya Mirin Binket, (Gaziyên Rojava), (Bîranîn), 2018, Ç1

53- Serkeftina li Rojava û Şoreşa li Zindanê, Seyran Şîlan, (Bîranîn), 2018, Ç1

54- Xewnên Biêş, Botan Hoşê û Narîman Evdikê, (Bîranîn), 2018, Ç1

55- Etyra Kûçik, Anahîta Sîno, (Çîrok), 2018, Ç1

56- Nivişt, Kawa Şêxê, (Çîrok), 2018, Ç1

57- Rûpelên Jînê 1, Nêrgiz Îsmayîl, (Çîrok), 2018, Ç1

58- Bêhna Xwînê, Raman Hesê, (Çîrok), 2018, Ç1

59- Ayeta Sê Tîpan, Bahoz Kobanê, (Helbest), 2018, Ç1

60- Tehto Pelo, Fîxan Hîmo, (Helbest), 2018, Ç1

61- Rêwiyê Bê Dem, Armanc Hêvîdar, (Helbest), 2018, Ç1

62- Roj, Ciwanê Dêrîkê, (Helbest), 2018, Ç1

63- Rojda, Îbrahîm Reşo, (Helbest), 2018, Ç1

64- Ala Zer, Xorşîd Botî, (Helbest), 2018, Ç1

65- Sirûşek ji Xweragiriya Efrînê, (Helbestvanên Kobanê), (Helbest), 2018, Ç1

66- Vîn û Viyan, Ebûdê Mexso, (Helbest), 2018, Ç1

67- Peyamberên Azadiyê, Kudyar Dire`î, (Helbest), 2018, Ç1

68- Peyala Xeman, Mihemed Sîno, (Helbest), 2018, Ç1

12- Gewrê Gewro, Husên Engîzek, (Roman), 2017, Ç1

13- Bênav, Husên Engîzek, (Roman), 2017, Ç1

14- Girê Şêran, Menaf Osman, (Roman), 2017, Ç1

15- Sînor, Menaf Osman, (Roman), 2017, Ç2

16- Evîna Bê Veger – Gundê Sîtê, Yezda Havîn, (Roman), 2017, Ç1

17- Rêwiyek Azadiyê, Fehîma Deştan, (Çîrok), 2017, Ç2

18- Çirûskên Nû, Fehîma Deştan, (Çîrok), 2017, Ç1

19- Ber Bi Zozanan Ve, Fehîme Deştan, (Çîrok), 2017, Ç2

20- Çirûskek Ji Berxwedana Kobanê Sererastkir' (1), (Kom), (Çîrok), 2017, Ç1

21- Dema Gelan, M.Cîhat Çobanoglû (Şahîn Dogû), Werger: Yekta Şoreş, (Çîrok), 2017, Ç1

22- Şahan, M.Cîhat Çobanoglû, (Çîrok), 2017, Ç1

23- Silava Bajariyan, Menaf Osman, (Çîrok), 2017, Ç1

24- Soza Pepûlkan, Siyamend Cemşîd, (Çîrok), 2017, Ç2

25- Xoce Smayîl, Mihemedê Pîrê, (Serpêhatî), 2017, Ç1

26- Berxên Me, Husên Engîzek, (Serpêhatî), 2017, Ç1

27- Di Siya Mirinê De – 1-2, Eqîde Tok, (Serpêhatî), 2017, Ç2

28- Ezîzê Tek Mistefê, Delîl Mîrsaz, (Dengbêjî), 2017, Ç1

29- Gurî, A. Gafur Doğan, (Şano), 2017, Ç2

30- Hemû Berhemên Şano, Mihemed Bîlal Yûsiv, (Şano), 2017, Ç1

31- Wêneyên Minî Şewitî, Fîxan Hîmo, (Pexşan), 2017, Ç1

32- Bahora Çiya, Sultan Qamişlo, (Helbest), 2017, Ç1

33- Birînên Min Nema Têşin, Fîxan Hîmo, (Helbest), 2017, Ç1

34- Jiyan, Bawer Can, (Helbest), 2017, Ç1

35- Nazenîn, Cindiyê Xizan, (Helbest), 2017, Ç1

36- Dîsa Kêm Dimîne, Fehîma Deştan, (Helbest), 2017, Ç2

37- Jana Peyvan, Necim Ebdulah, (Helbest), 2017, Ç1

38- Awazên Tenbûrê, Salihê Heydo, (Helbest), 2017, Ç1

39- Qîrên Me, Ehmed Mistefa, (Helbest), 2017, Ç1

40- Vexwendineke Çiyayî Ji Agirî Re, Mihemed Bîlal Yûsiv, (Helbest), 2017, Ç1

Rêveberiya Xweser ve pêk hatine, ew bû ku girîngî û guhdaneke mezin daye mafên ziman û çandî yên gelan, her wiha azadbûna weşan, çapkirin û rêxistinkirina tevgera wêjeyî ye.

Weşanxane, çapxane, sazî û navendên wejeyî û lêkolînê û yekîtiyên rewşenbîr û nivîskaran ku di deh salên dawî de hatine avakirin, roleke aktîv di ware alîkariya nivîskaran û çapkirina berhemên wan de, lîstine.

Ev bîblografiya heyî di nav xwe de lîsteyên pirtûkên kurdî li Rojavayê Kurdistanê ji sala 2012'an heya hezîrana 2022'an digire. Her wiha analîza wan lîsteyan ji bo zelalkirina hejmar û rewşa pirtûkên çapkirî li herêmên Bakur û Rojhilata Sûriyeyê.

Lîsteyên Pirtûkan:

Weşanxaneya Şilêrê

Di sala 2017an de li bajarê Qamişlo hatiye damezrandin. Heya Hezîrana 2022'an nêzî 261 pirtûk derxistine. ji wan 156 bi zimanê kurdî û 105 bi zimanê erebî ne.

1- Şoreşa Civakî û Jiyana Nû, Abdullah Ocalan, (Lêkolîn), 2017, Ç2

2- Ziman û Çalakiya Rastiyê, Abdullah Ocalan, (Lêkolîn), 2017, Ç2

3- Qulingên Rewanê Dengbêjî û Sazbendiya Kurdên Qefqasya, Polat Can, (Lêkolîn), 2017, Ç1

4- Şehîd Şehîdan Vedibêjin, Berhevkirin: Azad Ararat, (Lêkolîn), 2017, Ç1

5- Li Ser Mûzîkê, A.Rahman Çadirci, (Lêkolîn), 2017, Ç1

6- Bîranînên Bazên Sûra Amedê, Peyam Bêrî, (Lêkolîn), 2017, Ç1

7- Rewan, Dilawer Zengî, (Lêkolîn), 2017, Ç1

8- Bingeha Fêrkirina Rêzimana Kurdî, Dilovanê Deştê, (Lêkolîn), 2017, Ç1

9- Şoreşa Azadiya Rojavayê Kurdistanê – 1/2/3, Mihemed Emîn Mutlu û Ersîn Çelîk, (Lêkolîn), 2017, Ç1

10- Jineolojî, Dillzar Dîlok, (Lêkolîn), 2017, Ç1

11- Jiyana Min Her Tim Şer Bû – 1-3, Sakîne Cansiz, (Jiyanname), 2017, Ç2

Bîblografiya Pirtûkên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê 2012-2022

Hejmara pirtûkên çapkirî li herêmên Rojavayê Kurdistanê -Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji sala 2012an heya hezîrana 2022an gihşte (763) Pirtûkan (danerî, amadekarî, werger), ji wen 432 bi zimanê kurdî (57% ji hemû pirtûkên çapkirî) ..

Dilşad Murad*

Piştî destpêkirina şoreşa 19ê Tîrmehê sala 2012'an û damezrandina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk di sala 2014'an de, herêmên Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilata Sûriyeyê bi giştî ketine nava pêvajoyeke nuh de. Yek ji guhartin û veguhertinên mezin ên ku ji aliyê

*Nivîskar û rojnamevan e, di sala 1984'an de li Dêrikê ji dayik bûye, Sernivîskarê giştî yê Kovara Şermola ye.

wêjevanan diyar dibin, çemên wêjeyê bi berheman heke qels bin jî, av didin.

Bê guman dîmenê çandî û wêjeyî, di şoreşê de pêş dikeve, tevî hin têbîniyên bûrî jî, lê nuha ji dema bûrî pir erênîtir e, gelek xewn pêk hatine.

Dema em rola wêjevan, rewşenbîr û nivîskar dinirxînin, mebest ew e ku beramberî qurbanî û goriyên ku di şoreşê de hatine dayin, têrê nake, çiku derfet vebûye, dergehên saziyên rewşenbîrî vebûne û hemû pênûs jî azad bûne, lê hîna pênûsên me negihîştine cudakirina serbestiyê ji azadiyê, serbestî çi ye û azadî çi ye, tê negihîştine, loma pêşketin lawaz e.

Pêdiviya me bi şoreşa hizirî, çandî û wêjeyî heye, lehengiyên piştî deh salan ji şoreşa 19`ê tîrmehê, destkeftiyên dîrokî, deh hezarên pakrewanên jin û mêr, guhertinên bingeha civakî û hişmendiya jin û mêr, bîrawerî û welatperweriya xort û ciwanan, jiyana hevbeş li nav hemû pêkhateyan û biratiya gelan (piradîgma netewa demoqratîk), şoreşa ziman, navend, peymangeh û zanîngehên avabûyî, ev tev de li ser wêjevan ferz dikin ku di derya şoreşê de melevaniyê bike, nêçîrvanê bûyeran be, rastiyan bi helbest û romanan tomar bike, lehengiyan bi hemû cureyên wêjeya hinkûfî serdemê belge bike, guhertinên civakî û destkeftiyên şoreşê bi rêya çîrok û çîrvanokan, pend û zûgotinokan, biwêj û pêkenokan, destane û hemû cureyên wêjeya mezin û zarokan, ji nifşên bê re, hem jî ji raya cîhanî re veguhêze.

Ji cîhanê re pênase bike, bê ka şoreşa Rojava çi ji mirovahiyê re kiriye û dike û dê bike jî, çawa şoreşê dest pê kir, çawa YPG û YPJ û ji wan jî HSD hatin amadekirin û çi kirine, bi şahnazî û aşkere bibêje, navên pakrewan û lehengên jin û mêr di wijdanê mirovahiyê de her zindî vejîne, berxwedanên Kobanê, Efrînê, Serê kaniyê, Girê spî û tevaya bakurê rojhilatê sûryê, di ber çavên mafxwazên cîhanê re derbas bike, şer û cengên li hember hêzên tundraw mîna Daiş û yên weke wan, hem jî recîma turkyê û çeteyên wê û pîlanên navnetewî yên li dijî şoreşa azadiyê, belav bike.

Nuha ji wêjevanan tê xwestin ku wêjeye cudakar û berhemên giranbuha, weke berdewamiya şaristaniya me ya dîrokî, amade bikin û li seranserî cîhanê belav bikin.

Rast e, cudahî û cêwaziyên berfireh, li navbera wêjevan, rewşenbîr û siyasetmedaran hene, lê asîmanê rewşenbîran ji van têvelan firehtir e, her yek dikare bi azadî xizmeta çand û wêjeya civaka xwe bike, dikare weke rexnevanê avaker, li nava civaka xwe tev bigere û bixebite, rewşenbîr an wêjevan dikare bibe pirojeyeke ku rêbertiyê jî bike, divê piştgirê siyaseta civaka xwe be û alîkarê danasîna jiyana xweş be, divê şêwirmendê qonaxên zor û zehmet be, tu caran xwe weke dijber ne ji kesên siyasetmdar re û ne jî ji tu kesên dilêşê civakê re nede bikaranîn.

De îcar şoreşa Rojava jî, di qonaxa şoreşgerî ya herî li pêş re derbas dibe, wêjevan û wêjecan jî, bi vê şoreşê re, bêtir mirov dikare bibêje şoreşa çandî berdewam dikin, çiku kêmasiyên wêjenan û wêjeqanan in, rola wêjeyî qels dikin, loma hin hewildanên heyî jî, dibin berhemên hunera çandiyane.

Rast e, pêşketin û guhdan heye, zimanê kurdî û pêkhateyên din jî vejîn dibe, hewildanên pêşxistina çanda gelêrî jî hene, lê hîna vavartinên girîng nebûne, da bigihêjin asta şoreşa wêjeyî, sedem jî pir in; weke mînak: Xwendevanên pirtûkan kêm in, hem jî berê gel û civakê maye li tilvizyon û enternêtan, nema kes dixwîne ta ku bigihêje asta binivîsîne jî, loma wêjevanên şoreşger li nav me kêm in an jî nehatine avakirin, çiku hîna ew seqaya gîştî ji wêjeyê bi xwe re jî, nehatiye peydakirin.

Lê belê, tiştê herî balkêş ew e, ku nayê beramberkirin bi xwedêgiravî şoreşa Sûrî re, ya ku hatiye firotin, hişyariya hizir û ramanan, di şoreşa Rojava de, ta astekê li pêş e.

Erê, pir pirtûk derdikevin, lê gelek ji wan, ji hêla naverokê ve ne girêdayî şoreşê ne, yên girêdayî şoreşê jî, tenê helbest û gotar in, ango li gor dewlemendiya bûyerên Rojava, nemaze mijarên berxwedaniya jinên têkoşer, ku di cîhanê de pir kêm in, destan û lêkolînên wêjeyî jê re pêdivî ne.

Pirsgirêka me ew e ku wêjevan ji zikê şoreşê çê nebûne, hem jî gelek nivîskarên ku li ser rêya wêjeyê bûn, naçarî koçberiyê bûne, piř kêm ji wan li welêt û di şoreşê de mane, loma ew nivîskar û wêjevanên ku xwe bibînin xwediyê şoreşê kêm in, dêmek pêwîste ku wêjevanê şoreşê di nava şoreşê de, bûyerên şoreşê û jiyana şoreşgeran jiyan bike û bibîne, pê bandor bibe, da ku karibe mijarên xwe ji wê jiyanê bigire, geş bike, anînber bike, ektîv û çalak bike.

Di warê ragihandinê de jî, em dikarin bînin ziman ku weke kes, gelk jin û mêrên Rojava rolên mezin lîstine û gorî jî dane, lê weke sazî û dezgehên ragihandinê; ew jî weke sazî û dezgehên wêjeyê, rola wan pir qels û lawaz e, negihîştine asta cîhanî û kelijîna nûçeyên bûyeran û bandorkirina wan li ser asta cîhanî, ango hîna jî saziyên ragihandinê yên Rojava, tevî hin hewildanan jî, bi pîşekarî nebûne xwediyê pêşxistin û serkeftina şoreşê, ango ji asta cemawerê xwemalî derneketine, vacî vê jî, saziyên ragihandinê yên cîhanî û hin kesayetên arezûmend, bêhtir xizmeta vê şoreşê kirine û cîhan pê hay kirine.

Li Rojava şoreşek çandî heye, bi şoreşa civakî re, di hemû waran de jî xwe ava dike, xewnan pêk tîne, sazî ava dibin, mehrecan û simînarên çandî, hem jî hunerî li dar dikevin, her nivîskar, rewşenbîr û wêjevan tiştên di tûrikên xwe de, rojane derdixînin, nemaze di salên dawî de, guhertin çê dibin, nifşên nû ji nivîskar û

Hêjayî gotinê ye ku, recîmê zimanê kurdî bi biryarên fermî qedexe dikir, nivîskar, zimanzan, wêjevan û rewşenbîrên ku gelekî veşirtî û bi dizî çalakî dikirin jî, digirtin û ditirsandin, lê ji pêkhateyên din re, yên weke siryanî, aşûrî û ermen derfeta hînkirina zimanê xwe, ta astekê vekirî bû, di perestgeh, dêr, kenîseyan û dibistanên girêdayî wan de hînî zimanê xwe dibûn.

Tevî ku recîmê li dijî gelê kurd, hemû siyaset bi kar tanîn, hewil dida ku kurdan ji pêkhateyên din dûr bike, lê gelê kurd di rewşeke awarte de, dikarîbû têkiliyên civakî û abûrî, bi pêkhateyên din re ava bike, nemaze di qonaxa şoreşê de, bi awayekî berfirehtir rewşa aştiyane hate parastin, mirov dikare diyar bike ku ev hemû jî, ne bêyî pêşketinên wêjeyî bû û tevgera wêjeyî li kêleka siyasî, mil bi mil rol lîstiye.

Dêmeke asoyên wêjeyî fireh bûne, berhemên wêjeyî jî, xwe ji bandorên çewisandinê riha kirine, ji çavkaniyên şoreşê vexwarin, ji gencîneyên bûyerên şoreşê sûd û ji berxwedaniya rûmetê hêz girtine, hem jî, çi bi zimanê kurdî û çi jî bi zimanên pêkhateyên dîtir, daholên halana serhildanê lê dane.

Çand bi giştî û wêje bi taybetî weke can û giyanên civakan hatine terxankirin, ew belgeyên şûnmayên giyanî, ji şaristaniya heyber re ne, loma wêjeya kurdî, di şoreşê de roleke mezin di pêşketina çand û hebûna civakên Rojava de lîstiye, nemaze wêjeya şoreşgerî ku pêwirdara dîtin û aşkerekirina nexweşî û qeyranên civakan e, kêmasiyan nas dike, vedibîne û çareseriyan jê re terxan dike.

Wêjeya şoreşê wêjeyeke wêrek e, ciwankar e, gurker û aramker e, hem jî rexnevan e, lê mixabin di şoreşa Rojava de, wêjeya kurdî bi piraniya xwe, ketiye bin bandora siyaset û partîtiyê de, bêhtirî naveroka xwe, sambol û durişmeyên siyasî û partîtî, di hemû cureyên xwe de dihewîne, helbest û roman, çûrok û pexşan.. û gelek cureyên din ên wêjeya me ya vê şoreşê, witar û nûçeyên teng in, ne li gor asta berxwedaniyên Rojava ne.

Wêjevan jî, li gor nerîna min çar cure ne; wêjenan, wêjeqan, wêjevan û wêjecan, mixabin wêjenan ên ku ji berhemên siyasetên partîtî ne, asoyên wan pir teng in, nikarin û nizanin derveyî nerînên partiya xwe bibînin, wêjeqan jî, ew ên ku di qeyranan de, kaba xwe davêjin nava kefteleftê, hema çi bi dest wan ket (çik, pik, ker an mîr be) ne xem e, lê wêjevan û wêjecanên ku serkêşiya şoreşan dikin, hem jî destanên şoreşan ji dîrokê re tomar dikin pir kêm in.

Divê wêjeya şoreşê nûjen û ciwankar be, di hemû warên jiyanê de afrîner be, hem jî ji rêyên çareseriyê re dîvan û nîşander be, çiku ew cureyê hunera diyarkirina diyardeyên rastiyê ye, ango ew rêya şoreşê xweş dike, hem jî şoreşê pênase dike û bi rê ve dibe, da ku pêş ve biçe.

Pêdivê ye em amaje bikin ku di dema recîmê de, kurd bi pêkhateyên din re dilsoz in, hinek nivîskarên kurd, ên ku bi erebî dinivîsin, hewil dane ku xwe nêzî saziyên erebî li welêt bikin û tevlê jî bibin, lê her dem jê bêpar mane û nehatine pejirandin, tenê hin kesên ku egera wan saziyên erebî bi wan hebû, ew pejirandine, tenê ji bo sûdê ji wan bigirin, gelek nivîskarên kurd hewil dane, bi birayên xwe yên ereb re, di yek welatî de li hev bikin û hev rêz bin, her dem pêrgî dûrxistinên yekser û eşkere bûne.

Em ê nuha jî, hinekî derbarê zimanên herêma Cizîrê dahûrînin:

Herêma Cizîrê, herêmeke dewlemend e, pirçand û pirşaristanî ye, li bakurê rojhilatê Sûryê, kaşaneke rengîn ava kiriye, bi pirbûna peyv û axaftinan, derbirîna xweşiyeke dîrokî û jiyaneke hevbeş dide.

Ji ber têkiliyên civakî li ser vê xaka hevbeş, nêzîkatiyên tevlihevkirina xwînê, têkiliyên civakî, çandinî, bazirganî û mirovahiyê, li nav civakên herêmê, kiriye ku recîma Sûryê zimanê erbî, tenê hiştiye zimanê fermî û hemû ziman û devokên din qedexe kiriye, mîna kurdî, siryanî, ermenî, aşûrî û hwd, lê tevî vê setemkarî û çewisandinê jî, evan gel û civakan ziman, kevnetor, folklor, helbest û toreyên xwe yên taybet parastine, hemû pêkhateyên li ser vê xakê, ta astekê hev nas kirine û ji hev tê digihêjin, di warê wêjeyî de jî, Cizîrê komeke helbestvan û wêjevanên ciwankar afirandine, sûd ji dewlemendiya çanda herêmê û pirzimaniyê girtine, hizir û ramanên xwe ji çavkaniyên dîroka herêmê û şaristaniya wê av dane.

Zimanê erebî, zimanê fermî maye, lê ji ber ku kurd pêkhateya herî berfireh e li cizîrê, ji dîroka kevnar de li ser xaka xwe maye, zimanê kurdî jî li vê herêmê maye zimanê herî belav û piraniya kesên herêmê pê daxivin, hem jî zimanê kurdî rola navbênkar li gelek waran de lîstiye, tevî ku recîmê hemû hewildanên qedexekirin û tunekirinê pêk aniye.

Gelek manşêt, tablo û navên firoşgehan, ku bi du yan sê zimanan, ji wan jî kurdî, li herêmên mîna Hesekê, Qamişlo, Amûdê, Dêrikê, Tirbespiyê, Dirbêsiyê, Serê kaniyê û hwd hatine binavkirin, vê yekê belge dikin.

Tevî ku zimanê erebî zimanê fermî bû û kurd, siryan, aşûrî, ermen û hwd jî, tevan ji bilî zimanê xwe hînî erbî jî dibûn, lê mixabin erban xwe hînî zimanên wan nedikirin û ta nuha jî, tevî ku di vê şoreşê de, derfet û delîve pir vebûne, lê nebûye çandek di nav birayên ereb de, ku herin dibistanên zimanên din jî bixwînin, an jî hewil bidin ku xwe hînî zimanên din bikin û bi wan pêkhateyan re bi zimanê wan baxivin.

Erê recîmê zimanê kurdî qedexe kiribû jî, lê kurdan bandora devokî li cîranên xwe yên ereb kirine, li gelek taxên gelek bajaran, ereb jî weke kurdan hînî kurdî bûne, heke pê napeyivin jî, lê belê guhdar dikin û tê digihêjin.

vexwarine û sûd jê wergirtine.

Oldarên kurd jî roleke mezin û girîng di warê pêşxistina hiş û mejî, hem jî bîrawirya gelê kurd de lîstine, hizir û ramanên netewî û girêdana bi neteweyê û ziman ve belav kirine, mînak jî pir hene; wek Mele Ubêdulahê Hêzanî ku li hucreyên olî, waneyên olî bi zimanê kurdî didan û kesên mîna Cegerxwîn û Tîrêj û hinên din ji wan dibistanan derhatine.

Recîma nijadperest jî, rola jevxistin û jevdûrkirina wêjevanan bi zanebûn lîstiye, rik, kîn û dijminahî di nav wêjevanan de gur kiriye, lewra wêjeya kurdî li Rojava tenê di çarçoveya xebat û hewildanên kesane de maye, xebata wêjeyî ji karê sazomenî û komelayetî bêpar maye, hin komikên nivîskarên kurd peyda bûne, dijîtî û rikeberiya hev kirine, rewşa wêjeya kurdî ta berya şoreşê jî pir zor û asteng kirine.

Lê di qonaxa şoreşê de, piştî ku hemû herêmên kurdî ji desaleta recîma raser hatine valakirin û rola recîmê jê hate qewirandin, kar û xebatên wêjeyî ronahiya rêyeke nû dîtin û bi ber statoyeke nûvar ve gav hatin avêtin, rewşa wêjeyê ji çewisandina serdestan riha bû, wêjevanan xebatên sazomenî bi rê ve birin, nemaze dema ku zimanê kurdî, li navend, dibistan û peymangehan, kete warê bikaranîn û piratîkê de, bû alîkariyeke yekser ji wêjeya kurdî re û gavên lezgîn û avaker hatin avêtin, di hemû warên jiyanê de li Rojava, siyasî, civakî, wêjeyî, abûrî û hizrî jî, rolên pêşketî û serkeftî hatin lîstin.

Lê belê wêjevan û nivîskaran, nikarîbûn heta dawî, ji çanda ku recîmê di nihad û wijdanên wan de çandibû xwe rêzgar bikin, ji hev balav bûn, ne hevra bûn, nerînên wanî siyasî curbicur bûn û ji hev dûr bûn, ta astekê ku dijberî hev bûn jî, bi sedema wê jevbelavbûna wêjevan û nivîskaran, dijîtiyên wêjeyî jî, li nav wan peyda bûbûn, her komikek wêjevanan girêdayî pêleke (partiyeke) siyasî bûn, ev ê yekê jî hişt, ku rêkeftin û levkirinên di warên wêjeyî de jî, li nav wan pêk neyên, her wêjevanek li şûna ku nihadê civaka xwe be, bûbû wijdanê partiya ku ew endamek jê ye.

Piştî ku rola recîmê, hin bi hin ji Cizîrê kêm bû û hêzên parastina rûmeta Rojava YPG û YPJ û di pê re jî HSD amade bûn, Rêveberiya Xweseriya Demoqratîk jî, ji hevpeymana siyasî ya ku ji piraniya nûnerên pêkhateyên Rojava (tevli gelek têbîniyên li ser karê rêveberiya siyasî) hate damezrandin, hemû zimanên civakê û devokên deverê, bi azadiyê re bihna xwe vedan û gelek navendên hînkirina zimanan vebûn, rêbazên hînkirin û parastina van zimanan, ji hêla rêveberiya xweser ve hatin amadekirin, her zimanek weke beşeke ji çanda herêmê ya giştî, xwedî lê hate derketin, ji nû ve vejînkirina çandên dever û herêman, weke kiryarên pêdivî û rêxweşkirinê, ji avakirina civakek hevrêz re, ku karibe bandorên şer û cengên ku welêt talan dikin derbas bike, hem jî karibin bi hev re bigihêjin çareseriyeke domdar û nêzîkirina van çandên hevbeş ji bo parastina aramiya herêmê çê bûn.

vê dawiyê ta digihêje dema şoreşa Rojava ye.

Di dîroka Sûryê de, gelek şeveng û cureyên wêjeyê hene, ji deqên omîdewerî ta bi efsaneneyên berdewamiya jiyanê, bi hebûn û nebûna mirovahiyê re.

Seba ku ev herêma kevnar û dewlemend, her dem bi felsefeyên mirovahiyê, nemaze jî bi felsefeyên olî re têkildar bû, zanyarî û zanestî tê de pêş ketine û bûye cîgeha zanyarî û wêjevaniyê.

Di sedsala dawiyê de jî, hînkirin belav bû, loma guhdana wêjeyê jî girîng bû, pê re jî hemû nijadên wêjeyî xwe dane pêş û bi pêşketina civakê re bi pêş ve ketine, hem jî tevgera xebat û têkoşîna li dijî dagirker û setemkaran û doza azadiyê, bûne fakterên aktîv û çalak, da ku wêjevanan helbest, pexşan, roman û destanên lehengiyê hûnane, komele û saziyên vê demê jî derfet ji wêjeyê re vekirine û tevî nîr û rewşên zor û zehmetiyê jî, ew sazî pê re bûne alîkarên pêşketinê, ji hemû pêkhateyên civaka Sûryê, navdarên mezin di warê wêjeyê de hatine binavkirin.

Piştî ku desaleta sûryê ji dagirkeran rêzgar bû jî, çand, ziman û wêjeyên pêkhateyên ji bilî ereban çewisandin û hewildanên tunekirinê pêk anîn, lê derfetên pêwendiyên gelê kurd bi derveyî xaka sûryê re, berfirehtir bûn û bi rêya alîgirên derveyî xaka Rojava, kurdan di hemû warên jiyanê de û bi taybet jî di warê wêjeyê de, xwe bi pêş xistin, nivîskarên berz û navdar, bi alîkariya beşên din ji welêt, li ser xaka Rojava derketin.

Tevî ku rewşa wêjeya kurdî li Rojava, li gor taybetiya şêniyên wê deverê ye û zimanê wan qedexe ye jî û ji bandora yekser û neyekser a rewşa giştî li Sûryê nayê cudakirin, lê her ew di bin tirsa qedexekirin û tunekirinê de maye, lê belê dîsan jî nivîskar û wêjevanên kurd ên navdar derketin, derd û kulên civak û gelê xwe, dîroka têkoşîn û serhildanên kurdan ji bo serxwebûn û azadiyê, hem jî erdnîgariya gelê kurd a dîrokî, bi zimanê erebî nivisîne.

Hin nivîskaran jî bi sergermiya xwe, bi kurdî nivîsîne, dîroka kurd û zimanê kurdî nivîsîne, helbest, çîrok, şano û hwd nivîsîne, mînaka herî navdar jî, kesên mîna seydayê Cegerxwîn, mele Tîrêj, seydayê Keleş, mele Nûriyê Hesarî, Reşîdê Kurd, Osman Sebrî, Nûridîn Zaza, Bavê Nazê û hwd…

Hinan ji wan bi pênûsa xwe, di hundirê welêt de xebat û têkoşîn dikirin, hinan jî li derveyê welêt, pênûsa xwe di xizmeta doza gelê xwe û azadiyê de bi kar tanîn.

Pêdivêyî gotinê ye ku; Rojava bi giştî û bi taybetî jî herêma Cizîrê, penageha hemû kesên ji ber setema neyaran reviyayî, ji parçeyên din ên Kurdistanê ye, dema ku şoreş û serhildanên kurdan dişkestin, ew direviyan û hemû li Rojava diholisîn û bi cîh dibûn, loma Rojava bû komgeha çandên curbicur a hemû parçeyên Kurdistanê, Rojava bû weke çavkaniya zanyarî û çandê, ta astekê ku zimanên pêkhateyên din li Sûryê jî, ji wê çavkaniya dewlemed têr

Rewşa Wêjeya Kurdî ya Şoreşê

Arşek Baravî *

Nuha ji wêjevanan tê xwestin ku wêjeye cudakar û berhemên giranbuha, weke berdewamiya şaristaniya me ya dîrokî, amade bikin û li seranserî cîhanê belav bikin.

Li destpêkê, divê em binasin ku pêşketina mirovahiyê, encama komeke pisporî, zanyarî, nerîn, bîrdoz û lêkolînan e, di qonaxên serdeman re derbas bûne, nifşan veguhêztine yên di pê xwe re, ta gihîştine dema nuha, mijara me jî wêje bi giştî li Sûryê û bi taybet wêjeya kurdî, ji sedsala

*Di sala 1963an de li Amûdê ji dayik bûye, lêkolînerê zimanê kurdî. Rêveberê Yekîtiya Rewşenbîrên herêma Cizîrê- Nivîsgeha Amûdê ye.

û Rojhilatê Sûriyeyê hêlişt ku ew tovên di bin sîstema û pergala navendî de tepisandî mabûn bipişkivin. Ev mîna gaveke hêja ye. Di heman wextê de rê vekirin ji bo berhemên jinê. Ku hestên jinê bibin helbest, çîrok, roman û bikaribe bi azadî xwe pênase bike. Ev gavên dîrokî ne, nabe em kêm û piçûk bibînin.

Her çende gelek perhem jî hatine çapkirin, lê belê hîna jî em nikarin bibêjin ku ew asta ku bersiva rihê şoreşa ronakbîriyê bide derneketiye holê. Hîna ronakbîr dihizire ka çi binivîsîne û çi nenevîsîne? ji bo kê binivîsîne? Rastî ew nivîskarê ku bê tirs û xwdiyê civakê û bi azadî derneketiye holê. Nivîsakarê ku derdorê razî bike heye, lê belê yê ku bikaribe şoreşa guherînê û bi bandor bike hîna derneketiye. Ev rastî û lewaziyeke. Ji hêlekê ve gelek berhem hatine çapkirin, lê berhema ku cîhanê bihejîne hîna lewaz e. Nakokiya herî mezin ev e; Rewşenbîr di nava şoreşekê ewqase ji agir de ye lê hîna jî rewşenbîr çi di warê ziman, çi jî di warê naverokê de nikare bibe bersiv. Di nav ewqase rastiyên qehremantiyê de hîna jî seransere û nizane wan qehremantiyan bike berhem ji dîrokê re.

Di nerîna min de; eger em dixwazin xwedî nivîskar û berhemên şoreşî bin, bê perwerde nabe. divê di bingeha saziya Dîwana Wêje de akademiya rewşenbîr û nivîskaran ava bibe. Heta cihekî mirov bi hestên xwe yên mirovî dighêje asta nivîskariyê. Ji bo ku nivîsînên hêja di nav şewata zehmetiyan de tê xuliqandin, ne hema ji xwe de. Lewma kesê rewşenbîr hîna nizane çi dixwaze. Hîna armanca wekî ronakbîrekî azad, nedaye diyarkirin. Wê çawa bikaribe ji bo gîştî welatê xwe binivîsîne. Ev pirsgirêkek gelekî girîng e. Ne girîng e çapxane pir bin, ne girîng e pêşangeh û weşanxane pir bin, bêguman ew jî girîngiya wan heye, lê ya jê girîngtir avakirina kesayetên ronakbîr e, ku bi rastiya resentiya koka xwe re bikaribe şoreşa ronakbîriya civakê ava bike.

Hetanî dikarim bibêjim ku nifşên nuh di vê mijarê de xwedî hewldanên girîng in, lê belê ew jî dixwazin texlîta welatên ji derve de bikin. Rast e welatên cîhanê jî ji bo me nimûne ne, lê rastiya welatê me jî heye, tê xwestin em li gorî wan rastiyan daneriyê pêş bixin. Wê demê erka li ser şanê Dîwana Wêjeyê ku bikaribe bi perwerdeyên curbecur pêş bixe û pîvaneke berhemên hêja derxîne holê. Rastiya xwe derxînin ber çavan, şoreşa ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatiye destpêkirin bi pêşengitiya jinê bi ser dikeve. Ji bo bikaribe vê misiyona xwe berdewam bike hîna tê xwestin ku li gorî demê û ser bingeha resentiya kokê di qada ronesansa civakê û hemû pêkhateyan bi xwe re bide pêşxistin, pêşbixe. Ev yek jî bi xulqkariya kêlî bi kêlî, sal bi sal û pêvajo pêvajo berdewam bike. Rastiya şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ev e ku şensê azadiyê da jinê. Taybet jî di vê qadê de ku wan xewn û xeyalên xwe bike berhem. Bi hezaran egîdiyên mezin ku li ser xaka me hatin jiyîn, li benda nivîsînê ne. Jin herikbar e, xwedî hêza jiyanê ye, lê ew cewhera xwe kirina behremandiya civakê û mirovahiyê wê hîna jî wateya xwe ya dîrokî biparêze.

herî mezin û xeternak jî ev e. Bi sedan êl, qebîle, malmezin, milet, çand, hunerên cuda, kelepûrên cuda cuda û hîna zindî ne, dijîn. Lê ji ber ku tenê bi ferasta: "yek hişmendî, yek al, yek dewlet, yek ziman" û yek û yek berdewam dike. Ev dihêle ku ew armancên ku bi derbasbûna dîrokê re pê bang kirine jî, li dijî wê derkevin. Ka vejîn? Ka sosyalîzm? Ka wekheviya gelan? Hemû li ser kaxezan ma. Lewma Sûriya jî yek ji wan welatên ku di nava xwe de mozayîka gelan, çandan, muzîkan û zimanan vedihewîne. Lê her di bin siya hişmendiya Partiya Baas'ê de hatine perçiqandin. Ne tenê niha, ji salên heftêyan de ev polîtîkaya tê meşandin. Hetanî li dijî gelên wekî Turkmen, Çerkes, Suryan, Kildan, Erebên Koçer û Kurdan jî. Hişmendiya dewleta Sûriyeyê her di navbera du rastiyan de çûye û hatiye; Hem xwestiye welatekî ronesansê be, hem jî di naverokê de xwestiye ferasetên xwe yên netewperestiyê biparêze û bi pergalekê jor û navendî de feriz bike. Di welatekî weke Sûriyeyê de çendîn dewlemendiya çandan heye, li beramberî wê ewqase qedexekirin jî dijwar e. Tu nivîskarekî kurd nedikarî bi zimanê xwe yê dayikê bi kurdî pirtûkên xwe yên wêjeyî çap bike. Ne tenê ev! Hetanî ger bi erebî jî berhemeke xwe çap bike tê xwestin destûr ji hêzên istixbarata dewletê hebe, ka ew daneriya wêjeyî li gorî hişmendiya dewletê ye an na? Hişmendiyeke ewqaseye ku tenê xeniqandinê di vê qadê de jî daye avakirin. Em dev jê berdin destûrdayîna weşanxaneyên kurdî û behremendiyên kurdî serbest bike, azadiya raman û qelema serbest jî qedexe bû. Kesên ku wê straneke kurdî jî bigotana ew dixistin girtîgehê de. Mînaka ber çavê me rehmetiyê Hunermend Mihemed Şêxo ye. Hisreta wî bû ku bi zimanê xwe têr li ser welatê xwe stranên bi kurdî bibêje. Hetanî dibistanên fermî jî tenê "yek ziman, yek al û yek netew" bingeh bû.

Bi salan e li dijî vê hişmendiyê berxwedanî û tekoşîna gelê Kurd heye. Di bin evqase qedexebûnan de jî dîsan kurdan şevbuhêrkên xwe bi dizî li dardixistin. Li ser rûpelan helbestên xwe didan nivîsandin. Nivîsên xwe bi deng û devokî diparstin. Rastiyek weha radixe ber çavan ev e; Beriya şoreşa 2011'an ku êdî li sernaserî Sûriyeyê serhildanek pêk hat, êdî dem hat ku milet ji vê hişmendiyê re bibêje, na. Ne tenê kurd hemû miletên ku ser vê xakê dijîn. Lê em dikarin vê bînin ser ziman ku şoreşa 2011'an ew lûtkeya helwesta gel e û di heman demê de biryara (xwe avakirina) fermî ye. Şoreşa 2011'an ne tenê sembola tekoşîna nuh û piştgiriya gelan e, bi xwe re gelek destkeftin anîne. Kurd bûn xwedî rol ku hetanî wan xewnên miletên erebî yên bi dehê salan veşartî mabûn vejîne, bi wate bike, derxîne ronahiyê. Her weha hêviyên azadiyê yên gelê kurd zindî bike. Pêşengiya biratiya gelan bike. Lewra di qada daneriya wêjeyî de derket pêş. Wekî wexanxane, çapxane, serbestbûna zimanê gelan hem di dibistanan de, hem jî wekî di qada wêjeyê de jî hîn zêdetir kir. Tu caran dewleta Baas'ê guh nedaye berhemên bi zimanê Suryanî, Turkmenî, zaravayên curbecur û taybet jî Kurdî.

Dikarim bibêjim; ku bi avakirina komîteyên wêjeyî, dîwana wêje, çapxane û gelek pirtûkxaneyan li Bakur

ku xwe di çarçoveya Netewên Yekgirtî Yên Ereban de bû. Mixabin dema ku girêdanên wê yên neteweyî lawaz bûn, rola wê ya şaristanî kêm bû, pêlên dagirkeriya kolonyalîst hêliştku yekîtiya wan bişke, zemîneke weha derket pêş ku bi hêsanî axa wan dagir bikin û çavkaniyên wê talan bikin.

Gelê Ereb li hemberî van pirsgirêkan bi israr bû, rastiya perçebûn, îstîsmar û kêmpêşketinê red bike. Bi wê baweriyê bû ku bikaribe vê rastiyê derbas bike û vegere qada dîrokê da ku bi gelên din ên rizgarbûyî re tevkariyê bike. Bêguman di avakirina şaristanî û pêşketinê de roleke wan a girîng heye.

Li welatê Sûriyeyê jî, derbasî pêvajoyeke dîrokî bûn, ku bikaribin bi teqandina şoreşa 8'ê Adara 1963'an a bi pêşengiya Partiya Baa's a Ereb a Sosyalîst ku ev şoreş pêk anîbû, serkeftina xwe ya mezin bi dest bixin. Li gorî wê demê desthilatdarî amûrek di xizmeta têkoşîna avakirina civakeke yekbûyî ya sosyalîst a Ereban de bû.

Partiya Baas'ê ya Sosyalîst a Ereb; yekemîn tevger bû di cîhana erebî de ku naveroka wê ya şoreşgerî ya rastîn da yekîtiya Ereban û têkoşîna neteweyî bi têkoşîna sosyalîst ve girêda, û nûnertiya îradeya neteweya Ereb û xwestekên wê yên ji bo paşerojeke ku wê bi wê ve girê dide hebû. Rabirdûya birûmet û jêhatî hişt ku rola xwe di serkeftina doza azadiya hemû gelan de bilîze. Bi tekoşîna partiya Baa's'ê ku bi xwe navê wê weke wate jî girîng bû (Vejîn, Ronesans, Ronakabîrî) ye, balkêş bû. Tevgera sererastkirinê di 16/ mijdara/ 1970'î de li ser daxwaz û xwestekên gelan derket, ev yek pêşketineke kalîteyî ya girîng bû û bi dilsoziya ruh, prensîb û armancên partiyê veguherî bû û atmosfereke guncaw çêkir. Bidestxistina çend destkeftiyên girîng ji bo berjewendiya girseyên berfireh, ku di serî de avakirina dewleta Yekîtiya Komarên Erebî bû, heta radeyekê serkeftî bû. Li ser vê bingehê zagonên ku partiya Baas'ê ya Sûriyeyê her çende hin zagon ji xwe di naveroka xwe de tijî netewperestiya teng bû, lê di hin zagonan de jî prensîb ew bû ku avakirina civakek sosyalîst û demokratîk armanc be. Gava em van rastiyên dîrokî careke din ber çav dikin û tînin beramberî hev, ji bo roja me ya îro em baş tê dighên ku bi rastî hetanî dewletên ku şoreş kirin ji bo azadkirina gelên xwe û soza demokrasiyê dane, ji heqîqeta xwe dûr ketine û di rastiya parastina mafên hemû gelan de neheqiyê xwe daye pêş.

Eger di zagonsaziya vê pergalê de jiyaneke komînal û sosyalîst hebe, naxwe çawa qedexirina zimanên gelan esas tê girtin? Eger amranc wekheviya milet û çandan be, naxwe çima rastiya miletekî di bin nerastiya miletekî din de tê perçiqandin?! Di warê çapemeniyê de qedexe, di warê rengîniya çandan de qedexe, di warê çapkirina nivîsên wêjeyî bi hemû cureyên xwe qedexe, tenê bi zimanê erebî serbest kirin!! Li vir xala mijara gotinê ev e; Ku dixwazim baş destnîşan bikim; Hetanî ev dewletên ku li ser bingeha wekhevî û biratiyê xwe avakirin û bang kirin, lê bi armancên xwe re jî ketin nakokiyan. Ev yek cihê mixabiniyê ye. Xwexapandina herî mezin di vê mijarê de ye, ew jî; Rojhilata Navîn tenê bi miletê "ereb" tê pênasekirin. Şaşiya

Şoreşa Wêjeyî Nebe, Bedewiya Berhemên Daneriyê jî ne Gengaz e

Nêrgiz Ismayîl*

Ne girîng e çapxane pir bin, ne girîng e pêşangeh û weşanxane pir bin, bêguman ev jî girîng in, lê ya ji vê girîngtir avakirina kesayetên ronakbîr ku bi rastiya resentiya koka xwe re bikaribe şoreşa ronakbîriya civakê ava bike..

Rojhilata Navîn ku ne tenê qada hemû pêşketinên ramiyarî, dîplomatîk û civakî ye; Di heman demê de dayika hemû şaristaniyan e. Em mijarekê eşkere û zelal bînin ser ziman wê hîna di cih de be; Wekî Miletê Ereb dikarîbû bibe xwedî roleke mezin di avakirina şaristaniya mirovî de, dema

*Nivîskar û rojnamevan e, Di sala 1975an de li Qamişloyê hatiye dunyayê, hetanî dibistana navîn xwendiye, di pêvajoya zaroktiya xwe de di nava xebatên çand û hunerê de maye, piştre tevli şoreşa azadiyê bûye. Karê wêje û ragihandinê dike. Çend pirtûkên wê yên çapkirî (Roman, Helbest, Pexşan) hene.

xwecihî bi asteke mezin beşdarî geşepêdana bizava wergerê dibin. Pirtûkxaneyên giştî û yên taybet ku bi wergirtin û firotina berhemên wêjeyî yên herêmî û biyanî ve mijûl dibin, hatin avakirin. Ji bilî pirtûkxaneyên ku ji aliyê navendên çandê ve li hemû herêman hatine vekirin, pirtûkxaneyên biçûk di hemû saziyên fermî yên Rêveberiya Xweser de, peyda dibin.

Yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran û saziyên din ên çandî jî rola wan di tevgera daneriya wêjeyî de heye ku berhem û pirtûkên nivîskaran pêşwazî dikin û çapkirin û belavkirina wan digirin ser milê xwe, her wiha sempozyum û salonên wêjeyî û maseyên xwendinê, di tevgera daneriya wêjeyî de xwedî rol in. Ji milekî din ve medya û ragihandin jî bi rêya kovarên wêjeyî, rojnameyên herêmî û kanalên televîzyon û radyoyê bi danasîna nivîskar û berhemên wan beşdarî weşana wêjeyî dibin. Divê em rola zanîngeh û akademiyên ku di van deh salên dawîn de hatine vekirin ku hewl didin şarezayên akademîk ên di warê ziman û wêjeyê de derxin holê, ji bîr nekin.

Em dikarin bibêjin ku jiyana wêjeyî gav bi gav li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêş dikeve, lê hîna negihaştiye asta ku weke şoreşekê yan jî ronesanseke wêjeyî were binavkirin. Helbet gelek sedem û faktor ku li pêşiya pêşketinê dibin asteng, hene. Mîna: rewşa siyasî û rewşa aborî, her wiha lawaziya giştî ya pîşeyî ya saziyên wêjeyî û çandî tevî pirbûna wan, lawziya nivîskarên herêmî ku di warê hizrî, wêjeyî û çandî de xwe bi pêş naxin, her wiha kêmzanebûna teknîk û cureyên wêjeyî û kêmbûna xwendina pirtûkan.

Ji ber giringiya tevgera daneriya wêjeyî di vejîna giştî ya şaristanî û çandî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de, Desteya Sernivîskar a kovarê girîng dît ku wê weke dosyaya hejmara nû (pazdemîn) bigire dest. Her wiha di vê hejmarê de gelek mijar û berhemên din ên wêjeyî hene, bi hêviya ku xwînerên hêja sûd û mifayeke baş jê werbigirin.

Lê piştî destpêkirina şoreşê guhertinên mezin pêk hatin, der barê pirsa zimanên zikmakî û belavkirina wan a fermî de giraniyek hate dayîn. Bi derbasbûna demê re jiyana wêjeyî ber bi rêxistinbûnê ve çû, nemaze piştî avakirina desteyên çandî yên rêveberiyên xweser li herêmên Rojava - Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, her wiha avakirin û vekirina çapxane û weşanxaneyên nûjen, komîteya wêjeyê, Yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran, saziyên wêje û lêkolînan, lidarxistina festîval û pêşbirkên wêjeyî, derxistina kovarên wêjeyî û rojnameyên giştî, ev hemû bûn sedema vekirina deriyan li ber nivîskaran û aktîvkirina tevgera nivîskariya wêjeyî li herêmê.

Ji bo nirxandina pirtûkan komîteyek ango dîwana wêjeyê heye ku girêdayî Desteya Çandê ye, ji ber ku weşanxane, pirtûkxane û çapxaneyên taybet jî hene ku di warê çapkirin û weşanê de kar dikin, lewma hemû pirtûk di nirxandina vê komîteyê re derbas nabin,

Piraniya nivîskarên ku li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijîn, pirtûkên xwe bi rêya weşanxane, çapxane û dezgehên wêjeyî yên herêmî çap dikin. Aliyên peywendîdar pirtûk û berhemên wan bêyî ku tu nirxekî madî ji wan bigirin, çap û belav dikin. Her wiha hejmareke kêm ji nivîskaran heye ku pirtûkên xwe li çapxane û pirtûkxaneyên taybet ser hesabên xwe didin çapkirin. Bi giştî di van deh salên dawiyê de bi sedan berhemên wêjeyî hatine çapkirin (nêzîkî 700 berhemên wêjeyî yên kurdî û erebî ji roman, çîrok, helbest, lêkolîn, bîranîn û hwd), hinek ji wan nirxdar in.

Her wisa di çarçoveya handana tevgera weşangerî û daneriya wêjeyî de, her sal li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê festîval, pêşbirk, xelatên wêjeyî û pêşangehên pirtûkan tên rêxistinkirin. Berhemên xwecihî (bi rêya weşanxaneyan) cihê xwe di pêşangehên pirtûkên derveyî de, bi taybetî li cîhana erebî digirin. Tevgera wergerê jî li herêmê hinekî çalak bûye û ji bo vê mebestê navendek taybet bi wergerandinê hatiye damezrandin. Her wiha hin pirojeyên taybet û weşanxaneyên

Pêşekî

Daneriya Wêjeyî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê

Desteya sernivîskariyê

Şoreşa ku di Tîrmeha 2012'an de dest pê kir, di hemû aliyên jiyana giştî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de, di nav de jîwariya wêjeyî û çandî jî, guhertinên kokî pêk anîn. Beriya salên 2011-2012an di encama fişar û tepeserkirina ku di ware çandî, civakî û siyasî de dihate pêk anîn, çalakiyên wêjeyî, di asta herî kêm de dihatin meşandin, gelek nivîskar û ronakbîr ji ber xebatên çandî û wêjeyî dihatin binçavkirin. Di wan deman de pirtûkên bi zimanê kurdî, yan jî pirtûkeke ku behsa doza kurdî û kurdan bike, kêmpeyda bûn, qedexekirinek li ser weşana bi zimanê kurdî û suryanî bi taybet hebû.

- **Werger**
- Jibîrkirin.. (Zekeriya Tamir, wergera ji erebî: Aram Hesen) 69
- Kataloga Baxçeyekî Ajelan ê Îranê.. (Leyla Fercamî, wergera ji zimanê Farisî: Ebas Mûsa) 71

- **Huner**
- Gula pîroz.. (Alan Ebdela) 73

- **Helbest**
- Hezar Cengên Bêdawî.. (Cemîl Xoce) 78
- Rêwiyên têkoşînê.. (Bêrîvan Xelîl) 80
- Xatirê dawî.. (Bêrîtan Hiso) 82
- Zimanê Koremaran.. (Ehmed Hesen) 83
- Koçberî.. (Hesen Xalid) 85

- **Serbest**
- Dîsa li ser Rewşa Romana Kurdî.. (Lokman Polat)..... 87
- Êzîdî û Zerdeştî.. (Arif Şingalî)..... 93

Naveroka Beşa Kurdî

- **Pêşekî**
  - Daneriya Wêjeyî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (Desteya Sernivîskarîyê) 5

- **Dosyaya Hejmarê (Daneriya Wêjeyî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê)**
  - Şoreşa Wêjeyî Nebe, Bedewiya Berhemên Daneriyê jî ne Gengaz e.. (Nêrgiz Ismayîl)..... 8
  - Rewşa Wêjeya Kurdî ya Şoreşê (Arşek Baravî)..... 12
  - Bîblografiya Pirtûkên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê 2012-2022 .. (Dilşad Murad)..... 19

- **Lêkolîn**
  - Melayê Cizîrî û Pênaseya Evînê -2-.. (Diyar Bohtî) 45

- **Hevpeyvîna Hejmarê**
  - Li Gel Helbestvan Kemal Necim e (Aram Hesen) 55

- **Pirtûkên Derketî**
  - Mîrateya Oblomov…Feraseta 'Oblomovtî'.. (Armanc Hêvî) 61
  - Pirtûkên Derketî.. (Desteya Sernivîskarîyê) 65

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.

-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.

-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.

-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.

-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin: Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.

-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên gîştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke nivîskar û rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê asta keda çandî bilind bikin di rewşên herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî , herêmî û xwecihî tevlî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbaniyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bidestxistina jiyaneke demokrat û azad , ku nirxên civakbûyînê yên bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênûsên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî asta bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bingeh û hêzeke bandorker, ku asta civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi gîştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşên awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştre ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendeke dîrokî digre ku reseniyeke ramyarî û wêjeyî peyît dike , ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi gîştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şiyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şiyarkirnê de dike, her wiha veguhastineke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi gîştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

Şermola

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Demsalî ye Hejmar 15 Havîn 2022

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Demsalî û Serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê weşandin.

-Di 24 Êlûna 2018'an hatîye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7›ê Sibata 2019'an de derket.

-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweserîya Demoqratîk a Herêma Cizîrê, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019'an Hatiye Dayîn, girtîye.

Rêveber û Sernivîskarê giştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarê beşa Kurdî:
Aram Hesen

Desteya sernivîskarîyê:
Aram Hesen
Abdullah Şikakî
Ehmed Alyûsiv

- Navenda kovarê:
Qamişlo, Taxa Xerbî, beramberî Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê.
-Malpera kovarê:
www.shermola.net
-E-MAIL:
shermola2018@gmail.com
-Telefon û whatsappa Sernivîskarê giştî:
00963-994712053

-Kovar li Çapxaneya Şehîd Herekol – Dêrik tê çapkirin.
-Belavkirin û Firotin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê: Saziya Ronahî ya Belavkariyê – Qamişlo 0938 374 196.
-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.
- Nirxê kovarê (3000 L.S).

Tabîoya: Rojda Xelîl



Tabîoya: Ednan Şerbeawî

Şermola

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Demsalî ye Hejmar 15 Havîn 2022



Daneriya Wêjeyî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê